## Rewşa romanên kurdî yên Sovyetê

Di romanên kurdî yên edebiyata Sovyetê de hin xalên hevpar hene ku hin ji wan ev in; çavkaniya berhemên wan çanda gel, folklor e, di berhemên xwe de pesnê rejîma Bolşevîk didin, realîzma sosyalîst heye. Romana Kurdê Rêwî jî yek ji wan romanan e ku.. ***Şêrko Janzêm / R.5***



## Em te ji bîr nakin kewa gozel

Hin tişt hene mirov dizane lê bîne ziman derdek e, neyne ziman jî derdek hêj mezintir e. Eyşe Şan ji bo min wiha ye. Di warê stranbêjiyê de Eyşe şan xwedî gewrî û pergala dengê kurdî ye. Ez dixwazim du bîranînên xwe parve bikim... ***Veysî Varli / R.11***




# xwebûn

14-20 KANÛN 2020 HEJMAR: 52 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org


# Guh bidin daxwazên gel

Li başûrê Kurdistanê gel bi daxwaza maf û azadiyê û her wiha li dijî nelirêtî û gendeliyan çalakiyan li dar dixin. Hikûmet li şûna ku guh bide daxwazên gel, bi tundiyê bersiv dide û heta niha zarok jî di nav de herî kêm 8 kesan jiyana xwe ji dest dane. Hinek parlamenter jî ji bo piştgiriyê bidin çalakiyan li parlamentoyê dest bi greva birçîbûnê kirin. Ev demek e mûçeyên karmendan nayên dayîn, azadiya çapemenî û civakê tune ye. Rojnameger Dîfaa Herkî têkildarî mijarê ji rojnameya me re axivî û da zanîn ku ger hikûmet guh nede gel û nerezîbûna gel li ber çavan negire dê rewş xirabtir bibe... ***R.6***



## Guh nedin daxwazên dagirkeran

Xwepêşandananên li başûrê Kurdistanê yên li dijî gendelî, pergala newekhevî û aboriyê didomin. Tevî hemû zext, êrîş û astengiyên rêvebiriya hukûmetê jî gelek peyamên piştgiriyê ji bo xwepêşanderan tên dayîn. 15 parlamenterên ji parlementoya Kurdistane ev çend roj in ji bo piştiriya xwepêşanderan li avahiya parlementoyê dest bi grevê kiriye. Tevgera Azadî jî bi daxuyaniyekê aşkera kir ku ew piştgirî didin xwepêşandanan û got divê gel xwe bi xwe bi rê ve bibe. Gelê Başûr îro ji bo mafê xwe li qadan e bes serokwezîrekî ku ewqas bi ajandaya dagirkeran kar dike mimkûn nîn e ku li gel guhdarî bike. Li gel ku ji firotina nefta başûr...

***Felemez Ulug / R.6***

## Komên nû grevê dewr digirin

Li girtîgehan ji bo tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi dawî bibe û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan bi dawî bibin, girtiyan di 27'ê Mijdarê de dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kir. Çalakiya greva birçîbûnê her diçe mezin dibe û komên nû grevê dewr digirin. Parêzvanên mafan, destnîşan kirin ku çalakiyên greva birçîbûnê ji ber polîtîkayên hikûmetê çêbûne û ji bo daxwazên girtiyan jî bi lêv kirin ku daxwazên wan hiqûqî ne û civak divê bibe dengê wan. Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay bal kişand ser greva birçîbûnê û diyar kir ku daxwazên... ***R.3***

## Rovî û dîkê xursê

Valakirina gundan,ne tenê zirar û ziyan da gundiyan, hemû ajal û teyr û teban jî, para xwe jê stend. ji vê valakirina gundan herî zêde ajalê di nava sewalan de yê herî qurnaz, rovî gelek xisar dît. binêre bê çi tê serê roviyê zane. Rovî her tim û dayîm di nava kêf û xweşiyê de dijiya. Dema birçî dibû,diçû bi dora şivan û gavanan diket û erzaqê xwe temîn dikir. Di nava bax û baxçeyan de çi fêkiyên ewil derdiket wî berî xwedî dixwar. Dema zayina pez û bizinan, bi xwarina pizanan qelew dibû û pirçika wî bi çar tiliyan dirêj dibû. Xwe di ser keyayê heft gundên xursê re didît.. ***Adil Başaran / R.10***

## Miradê Kinê û hin bîranîn

Miradê Kinê di nav muzîkjenên kurd de xwedî terzeke cuda û cihekî balkêş e. Di salên 70'yî de, li gelek gund û bajarên herêma Mêrdîn, Sêrt û Êlihê wekî 'Mîrê Ribabê' tê nasîn. Ji şevbuhêrkan heta dawet û gelek şahiyên li herêmê digere û bi deng, stran, çîrok û henekên xwe di dilê gelek ciwanan de cih digire! Demekê her çi qas hin alî û derdor dixwazin wî bi memûrtiyê ji stranbêjiyê dûr bixin jî ji eşqa stran û ribaba xwe dev ji stranbêjiyê bernade. Di salên 70'î de li her gund û navçeyeke Mêrdîn û Sêrtê de ji hindik kesan re bûye şens ku strana 'Seyrê û Eliyê Memed' ji dengê Miradê Kinê guhdar bikin... ***R.11***

# Zimanê zarok pê neaxivin mehkûmê mirinê ye



Piştî destwerdan û girtina gelek saziyên civaka sivîl ên kurdan, li şûna wan hin saziyên din hatin avakirin û yek ji wan saziyên ku xebatên xwe pirçandî û pirzimanî berdewam dike komeleya zarokan a bi navê 'Berî Her Tiştî Zarok' e. Ji bo em agahiyên berfireh li ser kar û xebatên vê komeleyê bi we re parve bikin, me bi seroka lijneya rêvebir a komeleyê Cewahir Sadak re ev sohbet kir. Sadak got ku zimanekî ku bi zarokan re nejî ew ziman mehkûmê mirinê ye û wiha axivî: "Zarok nasnameya xwe nas bikin lê divê ev xwedîlêderketin nebe înkarkirina çanda gelên li derdorê."... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

AMED TÎGRÎS

## Axaftina bi zimanê pitik û zarokan... *R.5*

## "Em" kurd kî ne?

Îro di nîqaşên parlamenteran de, çi li Ewropa û çi li Tirkiye û Kurdistanê peyva "kurdbûnê" dibe mijara nîqaşan. Dema li parlamentoya Tirkiyeyê parlamenterên kurd li dijî peyva "hemwelatiyên koka xwe kurd" derdikevin û pênaseya "hemwelatiyên kurd" wek nasandina nasnameya kurdbûnê derdixînin pêş, li Awusturyayê parlamentera bi navê Bêrîvan Aslan pênaseya "parlamentera kurd" dike pirsgirêk û naxwaze bi vî awayî were nasîn. Li gorî wê kurdbûna wê... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Koleyê ku dilê xwe dibijîne efendî

Van rojan sedsaliya Apê Mûsa (Mûsa Anter) di rojeva kurdan de ye, tê pîrozkirin, xelat tên belavkirin û di derheqê wî, malbat û derdora wî de ji her caran bêhtir gelek tişt tên gotin. Di vê navê re hin xalên şaş û nerast jî derketine ser şiverêya me. Di nav "xwende" û "maqûlan" de... ***Seyidxan Anter / R.8***

## Wextê peynîardişê şîdetî ameyo

Hemeyê dinya de verva cinîyan şerêko taybet ameyo îlankerdene û yeno rayiraberdene. Asta şîdetî tewr berz de ya. Zê ke ma vernî de vatbî, bingehê şîdetî hişmedîya bawiksalan de yo. Cinîyî zê male xo veyneno yo. Bi verkeşîya têkoşînî, cinîyê kurd verva nê polîtîkayan xeylê xebatî rayîr benê û polîtîkayê taybetî vero vecîyenê. Çimkî ma cinîyî êdî nêeşkenê bi şîdeto ke her roje ma kêm keno û bê nefes verdeno reyde bicuwîye. Êdî bes o, wextê peynîardişê şîdetî camîrdî ameyo. Bi avervistîşê pawitişê cewherî, bi tekoşîn! Çar perçeyê Kurdistanî de cinîyê kurd birayvistin bîyê û verva şîdetî bawiksalan û dewlete, xopawitişê cewherî aver vistî. Çimkî dewlet kiştox û êrîşkaran pawena... ***Helîn Uzel / R.9***

# Nêzîkatiya li hemberî jinên kurd!



Dûrket Suren

**Hin kes bi parvekirinên xwe, hin kes jî bi bêdengiya xwe ya li hemberî vê destdirêjiyê nêzîkatiya xwe ya 'demokratbûyîn' û 'azadiya jinê' diyar kirin. Hew maye ku bêjin (gelekan got jî) 'Kurd heq dikin, bila hedê xwe bizanibin...'**

Li bakurê Kurdistanê îşkence, destdirêjî, faktora bêcezatiyê, yanî nêzîkatiya dewletê ya li hemberî kurdan a bi salan...

Ev 72 sal in 10-17'ê kanûn weke Hefteya Mafên Mirovan a Cîhanî tê pîrozkirin û Tirkiye îsal jî bi binpêkirinên mafên mirovan vê hefteyê pêşwazî kir. Li gorî daneyên saziyên mafên mirovan li bajarên kurd lê dijîn ev binpêkirin hê zêde ne û metirsîdar in. Mixabin mînakên wê yên berbiçav her roj xwe zêdetir nîşanî me didin. Jixwe hin mînakên wisa hene ku mirov nizane çi têgehî lê bar bike. Bi rastî jî nivîsandina wê destên mirov dilerizîne, nîqaşkirina wê hêrsek pir mezin tîne. Mirov asê dihêle ango mirov nizane çi bike çawa bike! Ji ber ku li hemberî hin mijaran tu ne tenê rojnameger î ku pirsan bikî û nûçe û bernameyan amade bikî. Beriya her tiştî tu jinek î, kurdek î û ji polîtîkayên tê meşandin ne dûr î.

Li bakurê Kurdistanê îşkenceya destdirêjiyê ya bi destê hêzên dewletê pêk hat careke din hat teşhîrkirin. Dewlet bi pêkanînên xwe bi derûniya hemû jinan, nexasim bi derûniya jinên kurd, bi hêza jinên kurd ku li dijî êrîşan têdikoşe dilîze. Wisa bûye ku her roj rastî bûyereke din a nirxên kurdan ku çawa tê xwestin bê binpêkirin, cureyeke din a îşkenceyê tên, lê ne rast hatin e ku di her bûyerê de em rastî heman kiryarê jî tên. Belê kiryar heman in, ji ber ku ji avakirina komara Tirkiyeyê heta niha nav û rûyên wan kesan biguherin jî feraseta dewletê ya li dijî jin û zarokên kurdan neguherî.

**Bûyera tecawizê ya li Kercewsê**

Piştî derket holê li navçeya Kercewsê ya Êlihê polîs, leşker û çawişê pispor jî di nav de, 27 kesî dest dirêjî zarokeke 15 salî kiriye û bi 2 jinan fuhûş hatiye kirin, jin û rêxistinên jinan daketin qadan. Çalakî tên kirin, daxuyanî tên dayîn, mixabin ji ber edaleta kêm li ser medyaya civakî jin li edaletê digerin!

Ev mesele ji her alî ve meseleyeke giştî ya Kurdistan û Tirkiyeyê ye, lê ji ber ku di nav çend mehan de ev bûn çend bûyer li Êlihê diqewimin mirov vê pirsê dixwaze bike. Meseleya lîstika li ser jin û zarokên Êlihê tê lîstin çi ye? Li Tirkiyeyê, bi taybetî li Kurdistanê çanda destdirêjî ango tecawizê bi awayekî sîstematîk didome û ev polîtîka ne ji ber lawazbûna hêza jinê, dijberî wê tam jî ber rêxistinbûyîn û hêza jinê ye ya li dijî serdestiya mêr-dewlet û malbatê pêk tê. Li Kurdistanê girtina saziyên jinan jî girêdayî vê mijarê ye. Bajarekî weke Êlihê ku di salên 2000'î de bi xwekuştinê ket rojevê, bû ku weke bajarê jinê yê birêxistinkirî bê pênasekirin. Di her çalakiyên civakî de bêkêmasî jinên ciwan li pêş xuya dikirin û ev yek qet nayê hesabê desthilatdariyê.

**Ji salên 1990'î heta niha**

Mînakên salên nêz ên li Tirkiyeyê têrî hiqûqa dijminane ya li pêşberî me disekine dike. Ji Mûsa Çîtil ê salên 1990'î, heta Mûsa Orhan ê 2020'î rêbaza dewletê ya li dijî jinên kurd nehat guhertin. Di arşîvan de bi sedan mînakên wê hene. Mûsa yê 2020'î hêza xwe ji kesên unîformayê weke xwe li xwe dikir girt, ew ê heta hetayê mînakeke ku her li rûyê dewletê bê xistin bimîne. Dema ev çawişê pispor, tecawizkar û kujerê Îpek Er, Mûsa Orhan hat berdan, xuya bû ku ev berdewama polîtîkaya li dijî jinê, bi taybetî jinên kurd e. Bêcezakirin û xwedîderketina kesên weke wî dê bi xwere bûyerên nû bîne û mixabin em rastî mînakeke din a destdirêjiya bi destên endamên dewletê hatin.

Dewlet li xwe mikur nayê, kirinên endamên xwe diparêze û rê li ber sûcên nû vedike. Li şûna tecawizkar Mûsa Orhan, Îpek Er a li dû xwe bi nameyekê her tiştî derxist holê û malbata wê ya hesab ji dewletê dipirsî, hat tawanbarkirin. Di bûyera dawî ya Kercewsê de jî yên ku sûc kirine na, lê yên ku sûc derxistin holê û bûyer ragihandin, der barê wan de lêpirsîn hat destpêkirin. Biryara nepen a li ser dosyayê, qedexekirina belavkirina nûçeyê, gefxwarina nûçegihana JinNewsê hemû meseleya kurdbûyîn û nêzîkatiya dewletê di nav xwe de dihewîne.

**Mesele meseleya kurdbûnê ye**

Ger hikûmeta dixwaze di serê civakê de şik nemîne, wê demê divê bi biryar û daxuyaniyên xwe hêz nede endamên xwe. Ger hikûmet dixwaze ev ne êrîşeke bi zanebûn e li dijî jin û zarokên kurdan, bila "daraza wê" hemû dosyayan ji nû ve veke, hemû kiryaran bidarizîne, cezayên heq kirine bide, da ku tu şik der barê wê de nemîne, lê belê ev mesele meseleya kurdbûyê di xwe de dihewîne. Mesele meseleya polîtîkaya wan e. Mesele meseleya rêbaza şerê taybet e!

**Em behsa nirxên jin û zarokan dikin**

Ev bûyer bi biryara nepen a li ser dosyayan, bi destdanîna ser zaroka ku rastî destdirêjiya endamên wê hatiye nayê girtin. Rêxistinên jinan û saziyên mafên mirovan diyar kirin ku dê şopdarê vê dozê bin û nehêlin ser vê bûyerê bê girtin. Divê neyê girtin! Xuya ye armanca hemû hewldanên ew ku civakê hînî bûyerên bi vî rengî bikin, bitirsînin û li dijî îşkenceyan bertekên gel qels û kêm bikin. Ji ber vê yekê jî divê civak, bi taybetî jî rêxistinên jinan destûr nedin ku ser vê bûyerê were girtin.

Weke dawî madem em di hefteya mafên mirovan de ne û di vê demê de jî herî zêde li ser medyayê behsa mafan tê kirin û nivîsandin, dixwazim bi çend hevokan bi dawî bikim.

Ew nijadperestiya li Tirkiyeyê ya ji ber polîtîkayên cudakariyê bilind dibe di mijara tundiya dewletê ya li jinên kurd jî xwe nîşan dide. Hin kes bi parvekirinên xwe, hin kes jî bi bêdengiya xwe ya li hemberî vê destdirêjiyê nêzîkatiya xwe ya "demokratbûn" û "azadiya jinê" diyar kirin. Hew maye ku bêjin (gelekan got jî) "Bila polîs û leşkerên dewletê îşkence nekin, lê ger di sînorên bajarên kurdan de bin ne xem e. Kurd heq dikin, bila hedê xwe bizanibin.." Em behsa destdirêjiyê yanî tecawizê dikin! Em behsa nirxên jin û zarokê dikin! Em behsa ji bo her kesî mafên mirovan dikin heyran!





Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# "Em" kurd kî ne?

Rexneya herî mezin û bi bandor li teoriya femînîst a rojavayî ji jinên anglo-afrikî û indo-asyayî hatibû. Ew bi analîz û serpêhatiyên xwe yên bindestbûnê peyva "em jin" ku hemû jinan bi awayekî homojen wekhev didît, her wiha qurbaniya baviksalariyê ji bo hemû jinan bi heman awayî dinirxand, rexne kirin û gotin "na, gotina 'em jin' tenê xizmeta piştperdekirina êş û keserên me dike. Ne jin "homojen" in, ne jî serpêhatiyên jinên bakurê cîhanê û jinên başûrê cîhanê wekhev in. Heta daxwazên me jî ne wekhev in. Dema jinên bakurî ji bo mafê kar derketin kolanan, jinên başûrê cîhanê û heta jinên çîna feqîr û karkeran a bakurê cîhanê rojê heta 16 saetan dişixulîn. Heta gelek ji wan li nav malên jinên çîna navîn ku niha ji bo mafê kar derketibûn kolanan, tenê ji bo zikê têr bênavber dişixulin. Lewma jî rexneya jinên postkolonyal û dekolonyal dîrokî bû. Cudabûna jinan, bandorên cuda yên li ser bindestiyê, yên wek çîn, nijad, ol, çand û hwd. bi awayekî vekirî raxist pêş çavê me.

Bêguman ev nirxandin û rexneya li ser wekhevkirina êş û keserê, qurbaniyê, serpêhatiyên bindestbûnê bandora xwe bi giştî jî teoriyên dekolonyal û postkolonyal digire. Ango taybetî jinên anglo-afrikî di bin bandora van teoriyan teoriyên femînîzma reş û postkolonyal bi pêş xistin. Ji xeynî hevbeşiya di mijarên têkoşîna li dijî newekheviya zayendan û neheqiya li ser jinê, wekî ku Bell Hooks binxêz dike, li rûyê dinyayê bi qasî hejmara femînîstan têşeyên femînîzmê hene.

Ger em vê nîqaşê bi kurrdbûnê ve girê bidin, di nirxandinê de pir tişt naguherin.

Cegerxwîn di helbesta xwe ya bi navê "kî me ez" de li ser şopa dîrokê pênaseya kurdeke/î dike. Wekî hemû helbestên berxwederiyên di helbesta wî de jî kurda/ê ku tê tarîfkirin, serbilind, li ser doz û sonda xwe, li ser şopa pêşiyên xwe, têkoşera/ê welatê xwe ye, lê gelo bi rastî pirsa "kurd kî ye" dê karibe bi vê helbestê bersiva xwe bibîne? Dibe ku Cegerxwîn di helbesta xwe de daxwaza dilê xwe, yan jî baweriya xwe ya der barê kurdbûnê de anîbe ziman, em nikarin bersiva vê yekê bidin, lê li hêla din ne hewceyî îstasîstîkan e, ger em bibêjin kurd ne di dema Cegerxwîn de, ne di dema pêş wî de û ne jî di ya piştî wî de ne xwedî yek pênaseyekê bûn.

"Em kurd" peyva "em" pirî caran pir bi hêsanî bi kar tînin. Wekî ku kurd hemû wekhev bin, heman tecrubeyî jiyabin, di heman fikir û baweriyê de bin, digirin dest. Wekî mijara femînîzmê ku dibêje, "jin ji ber zayenda xwe bi şîdet, bindest û newekheviyê re rûbirû dimînin" em jî wek kurd ji ber kurdbûna xwe (wek gelên din ên xwecihî) bi şîdet, bindestî û newekheviyê re rûbirû dimînin. (Hin kes jî dibêjin ne kurdbûn, lê nijadperestî sedema şîdetê ye. Ango dibêjin, ger tu ne kurd bî jî dema tu li dijî nijadperestiyê derkevî leqayî şîdetê têyî, lê ev yek jî me dîsa vedigerîne meseleya newekheviya tecrûbeyên bindestbûnê. Rûyê nijadperestiyê li hemberî kurdbûnê cuda ye, li hemberî jinan, çepgiran an jî karkeran cuda ye. Em nikarin hemû bindestbûnan û têşeyên êrîşên li ser wan wekhev nîşan bidin) Em vê wek tespîteke sereke û tespîteke ku divê hemû kurdan bigihîne hevdu, li hêlekê bihêlin; lê di nav kurdan de jî têkiliyên serweriyê yên ne wekhev hene û ji hev cihê ne. Ev serwerî ji sînorên welêt wêdetir li her derî derdikevin pêşberî me. Her kurd ne têkoşera/ê welatê xwe ye, yan jî têkoşeriyê bi heman awayî nanirxîne.

Li hêla din di temsîliyet û nûneriya kurdan de jî ne yek temsîliyet heye, ne jî divê bibe. Kurdbûn di vê qadê de wek kategoriyeke polîtîk, îdeolojîk û civakî derdikeve pêşberî me û ji vir pê ve xwe pênasekirina bi kurdbûnê li gor helwesta mirovan diguhere. Lewma yê îro di nîqaşên parlamenteran de, çi li Ewropa û çi li Tirkiye û Kurdistanê peyva "kurdbûnê" dibe mijara nîqaşan. Dema li parlamentoya Tirkiyeyê parlamenterên kurd li dijî peyva "hemwelatiyên koka xwe kurd" derdikevin û pênaseya "hemwelatiyên kurd" wek nasandina nasnameya kurdbûnê derdixînin pêş, li Awusturyayê parlamentera bi navê Bêrîvan Aslan pênaseya "parlamentera kurd" dike pirsgirêk û naxwaze bi vî awayî were nasandin. Li gorî wê kurdbûna wê li axa ku lê hatiye dinê maye û ew niha parlamentera Awusturyayê ye û lewre jî kurdbûn helwesta wê ya civakî û polîtîk pênase nake. Ev yek konstrukta etnîsîteyê û têkiliya wê ya bi axê wek mijar dide pêşiya me, lê di çarçoveya vê nivîsê derbas dibe. Ez nizanim gelo dengdêrên ku wê ji ber navê wê û kurdbûna wê hilbijartine niha serê xwe li kîjan dîwarî dixin! Dema mirov kurdbûnê ne wek kategoriyeke polîtîk lê wek kategoriya serweriyê û jê berjewendî derxistinê bibîne, dibe qeşmera/ê qesran û divê "em kurd" jî ji vê yekê dersê derxînin. Tenê kurdbûn ji bo hilbijartinê bibe sedem û têkiliyên serweriyê yên dîrokî yên li derdora kurdbûnê neyên dîtin, ango kurd homojen bên dîtin, em ê nikaribin ji hêvîşikestinê xwe xelas bikin.



# Piştgiriya ji bo grevên birçîbûnê zêde dibe

Li girtîgehan ji bo tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi dawî bibe û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan bi dawî bibin, girtiyan di 27'ê Mijdarê de dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin.

Çalakiya greva birçîbûnê her diçe mezin dibe û komên nû grevê dewr digirin. Parêzvanên mafan, destnîşan kirin ku çalakiyên greva birçîbûnê ji ber polîtîkayên hikûmetê çêbûne û ji bo daxwazên girtiyan jî bi lêv kirin ku daxwazên wan hiqûqî ne û civak divê bibe dengê wan.

Hevseroka Komeleya Alîkarî û Piştevaniyê ya Ji Bo Malbatên Girtiyan a Marmarayê (MATÛHAY-DER) Esîn Çelîk got ku divê daxwazên girtiyan bên qebûlkirin. Serokê Giştî yê Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV) Dîdar Erdem jî destnîşan kir ku grevên birçîbûnê divê di çarçoveya azadiya fikr û ramanê de esas bên girtin û wiha got: "Ev daxwazên ku bi temamî daxwazên hiqûqî ne divê pêk bên." Berdevkê Komîsyona Girtîgehan a Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Stenbolê Mehmet Acettin jî ev tişt anî ziman: "Heger hêzên demokrasiyê, aktîvîstên mafên mirovan, partiyên siyasî, ciwan, jin û hemû kesên xwedî wijdan bên cem hev du û bi hev re tev bigerin dê encam bê girtin."

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay bal kişand ser greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li Îmraliyê hatiye destpêkirin û wiha got: "Daxwaza çareseriyê ya girtiyên ketine greva birçîbûnê, daxwaza me ye." ***STENBOL***

# Hemû maf tên binpêkirin

Navenda Nûçeyan

**Li Tirkiyeyê ji ber pergala yekparêziyê û kiryarên faşîzan hemû mafên mirovan ên bingehîn tên binpêkirin. Nemaze jî gelê kurd ji mafên xwe bêpar tên hiştin û zextên li ser gel roj bi roj zêdetir dibin**

Bi salan e 10-17'ê kanûnê wekî Hefteya Mafên Mirovan tê pîrozkirin û gelek peyamên 'mirovî' tên dayîn, lê peyamên hikûmetan wek axaftineke rûtîn dimîne û bênavber zext û zordarî dewam dikin.

Hefteya Mafê Mirovan hem ji aliyê serdestan ve tê pîrozkirin û hem jî ji aliyê bindestan ve ango kom, civak û kesên bi zextan re rûbirû dimînin tê pîrozkirin. Serdest ji bo îktîdara xwe biparêzin vê rojê jî wek amûr bi kar tînin û behsa girîngiya mafê mirovan dikin. Balkêş e ku hikûmeta AKP'ê bi boneya vê rojê behsa reforma hiqûqê û mafan dike, lê herî zêde di serdemên vê hikûmetê de mirov hatin kuştin û girtin û mexdûr bûn. Herî zêde di dema hikûmetên AKP'ê de maf hatin binpêkirin, di serî de girtîgeh û her wiha kolan veguherîne îşkencexaneyan. Hikûmet ji bo van kirinên xwe veşêre û xwe wek parazvanê mafê mirovan nîşan bide dîsa behsa hiqûq, reform û mafan dike, lê êdî civak rastiya AKP'ê baş nas dike.

Li aliyê din jî kesên demokrat û muxalif jî her sal bi boneya Hefteya Mafê Mirovan çalakiyên cur bi cur li dar dixin. Nemaze jî Komeleya Mafê Mirovan bernameyan çêdike. Îsal ji ber nexweşiya koronayê bername kêm bûne û bi boneya vê rojê di serî de Stenbol, Îzmîr, Edene, Mêrsîn û gelek bajarên din daxuyanî hatin dayîn.

Li Stenbolê parêzvanên mafên mirovan û endamên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) li qada Sultanahmetê daxuyanî dan. Li ser navê girseyê seroka ÎHD'a Stenbolê Gulseren Yolerî axivî û wiha got: "Ji bo aştî, edalet, wekhevî, azadî û rûmeta mirovan bê parastin û ev yek misoger bibe em ê têkoşîna xwe ya demokratîk berdewam bikin."

Platforma Ked û Demokrasiyê ya Mêrdînê jî bi heman armancê li avahiya KESK'ê bi tevlêbûna dehan kesan daxuyanî dan. Li salonê pankarta "Em ji bo cîhanek bêşer û bêmêtingerî têkoşîna xwe mezin bikin" vekirin. Beriya daxuyaniyê Endama Meclisa Dayikên Aştiyê Nure Tarlak, diyar kir ku li zindanên Tirkiyeyê di 27'ê mijdarê de girtiyan li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê kirine û wiha got: "Di hefteya mafên mirovan de li zindanan girtî 14 roj in di greva birçîbûnê de ne. Em bang li her kesî dikin ku daxwazên zarokên me bibînin û qebûl bikin. Em careke din naxwazin ji zindanan cenaze derkevin."

Her wiha bi heman armancê li Îzmîr, Mêrsîn, Hatay û Edeneyê jî daxuyanî hatin dayîn.



# Dixwazin destdirêjiya li Kercewsê veşêrin



Li gorî nûçeya Jinnewsê li gundekî navçeya Kercewsê ya Êlihê zarokeke 15 salî ji ber nexweşiyê çû nexweşxaneyê û piştre derket holê ku zarok ducanî ye. Ji ber gilîkirina zarokê ji heman gundî kesên bi navê M.A. û V.A hatin girtin. Hat diyarkirin ku polîs, çawişên pispor û cerdevan jî bi giştî 27 mêr eleqeya wan bi vê bûyera tecawizê heye.

Piştî ku ajansa jinan Jinnewsê nûçe belav kir bûyer di medyaya civakî de bû rojev. Ji bo nûçeyê biryara astengkirinê hat dayîn û her wiha polîsan gef li nûçegihana ajansê xwarin. Baroya Êlihê ragihand ku dê bûyerê bişopînin.

Berdevka Meclisa Jinan a HDP'ê û Parlamentera Êlihê Ayşe Acar Başaran têkildarî mijarê ji MA'yê re axivî û diyar kir ku hikûmeta tirk dixwaze ser bûyera Kercewsê bigire û wiha got: "Polîtîkaya li Kurdistanê tê birêvebirin divê cuda were nirxandin. Çimkî destdirêjî paryeçek jî şer e. Dixwazin destdirêjiyê li ser axa Kurdistanê asayî bikin. Dixwazin bi vî awayî feraseta rejîma yekperest li ser me ferz bikin. Sûcên ku ji aliyê hêzên dewletê ve pêk tê ne tesadufî e. Mînak windakirina Gulistan Doku ne tesadufî ye. Weqayên li Mêrdîn, Şirnex, Wanê ne tesadufî ne. Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soylû çawa ku di bûyera Îpek Er de xwedî li tecawizkar derketiye û jinan hedef nîşan daye di vê bûyera Kercewsê de jî Soylû xwedî li tecawizkaran derket û jinan û kesên bertek nîşanî bûyerê dane hedef nîşan daye. "

Başaran destnîşan kir ku çawa ku wan dest ji bûyera Îpek Er bernedaye wê dest ji bûyera Kercewsê jî bernedin û got: "Em ê serî ji tehdîtan re netewînin. Em ê dev ji agahdarkirina raya giştî bernedin. Em ê dest ji têkoşîna xwe bernedin." ***ÊLIH***

## Li bajarê Wanê kursa kurdî tune

Li Wanê ku milyon û 100 hezar mirov lê dijîn kursên gelek zimanan hene, lê belê kursa kurdî tune. Mamosteyên kurdî Elîf Gemîcîoglû û Îkram Îşler bang li her kesî kirin ku li zimanê xwe xwedî derkevin. Elîf Gemîcîoglû anî ziman ku 25 milyon kurd li bakurê Kurdistanê dijîn ji perwerdehiya zimanê xwe bêpar in û bal kişand ser bivê nevêtiya perwerdeya bi zimanê zikmakî. Gemîcîoglû, destnîşan kir ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî heq e. Mamoste Îkram Îşler jî wiha got: "Mirov bi pereyan zarokên xwe dişînin kursên îngilîzî, fransî, lê gava mesele tê ser kurdî, wan naşînin kursên bêpere jî. Lewma êdî divê em zimanê kurdî bikin mecbûrî û wekî pêdiviyekê esas bigirin. Ji bo eleqeya ji bo kurdî zêde bibe, pêşî divê em ji xwe dest pê bikin." ***WAN***

## Tirkiye bûye girtîgeha rojnamegeran

Federasyona Rojnamegeran a Navneteweyî (IFJ) ku navenda wê li Brukselê ye û ji 150 welatan 600 hezar endamên wê hene ji ber 10'ê Kanûnê Roja Mafê Mirovan a Cîhanî rapora binpêkirinên mafan a hemû rojnamegerên cîhanê pê re rûbirû dimînin parve kir. Di raporê de hat diyarkirin ku di 2020'an de 42 û ji salên 1990'î ve jî 2 hezar 658 rojnameger li ser karê xwe hatine qetilkirin. Di raporê de hat diyarkirin ku li gelemperiyê cîhanê 235 rojnameger girtî ne. Li gorî raporê welatê ku herî zêde rojnameger lê girtîne jî Tirkiyeye. Di raporê de Tirkiye ji rojnamegeran re weke girtîgeh hatiye pênasekirin. Welatên ku herî zêde rojnameger lê girtî ne bi dorê wiha ne: "Tirkiye 67, Misir 21, Çîn 20, Erître 16, Erebîstana Siûdî 14 û Belarûs 13." ***STENBOL***

## Ji Stenbolê berê xwe da gundê xwe

Piştî şewba Kovîd-19'ê gelek kes ji bajarên mezin û qelebalix berê xwe dan gundên xwe. Yek ji van kesan jî Cabbar Alp ê 33 salî ye. Alp, piştî salan ji Stenbolê berê xwe da gundê xwe Fêra ya navçeya Farqînê. Alp, 4 meh berê hatiye gundê xwe û niha hewl dide li nav erdê xwe fisteqan biçîne. Alp, heya niha gelek tiştên hunerî jî kirine. Di gelek şanoyan de lîstiye û du fîlmên kurt jî çêkirine. Fîlmê wî yê ewil "Anons" e. Anons, behsa qedexeyên derketina kolanan ên li Sûrê dike. Alp, bi vî fîlmê xwe gelek xelat girtine. Fîlmê wî yê duyem jî "Cî Nema" ye. Di vî fîlmê xwe de jî behsa zarokekî ku piştî qedexeya derketina kolanan û şerê li Cizîrê berê xwe dide Stenbolê dike. ***AMED***

## ZIMANÊ BI ZAROKAN RE NEJÎ EW ZIMAN MEHKÛMÊ MIRINÊ YE

# Berî her tiştî zarok

Navenda Nûçeyan

*Piştî destwerdan û girtina gelek saziyên civaka sivîl ên kurdan li şûna wan hin saziyên din hatin avakirin û yek ji wan saziyên ku xebatên xwe pirçandî û pirzimanî dike komeleya zarokan a bi navê 'Berî her tiştî zarok' e. Ji bo em agahiyên berfireh li ser kar û xebatên vê komeleyê bi we re parve bikin me bi seroka lijneya rêvebir a komeleyê Cewahir Sadak re ev sohbet kir.*

**Di destpêkê de ji kerema xwe hûn dikarin der barê komeleya 'Berî Her Tiştî Zarok' de agahiyan bidin me, ev komele kengî û çawa hate avakirin?**

Komeleya me di 2017'an de piştî ku qeyûm avêtin ser şaredarî û gelek komeleyên me yên çand û hunerê yên civaka sivîl hatin girtin, me ev komele ava kir. Yek ji sedemên bingehîn ên avakirina vê komeleyê jî geşkirina zimanê kurdî bû. Mixabin gelek saziyên li ser ziman, çand û hunera kurdî ked didan hatin girtin û di nav civakê de ziman dîsa vekişiya malê. Armanca me ew e ku em di van şert û mercan de, di nav zarokan û civakê de xebatên li ser kurdî geş bikin. Armanca bingehîn a projeyê ew e ku zarokan bi mîrateya çandî ya cîhanê, bi teknolojiyê û bi hunerê re bîne ba hev. Mesela xebata dîjîtal a gelek muzeyan nîşanî zarokan dide heye. Li şûna ku zarokan ji teknolojiyê dûr bixe, bi rêya xebatên wiha yên hunerî zarok ji teknolojiyê sûd werdigirin.

**Xebatên we tenê ji bo zarokan e?**

Belê navê komeleya me 'Berî Her Tiştî Zarok' e lê em tenê bi zarokan re xebatan nakin, pêşî em bi kesên tesîrê li zarokan dikin re xebatan dikin, ji ber wê jî em berê xwe didin malbatê. Çiqas em atolyeyê bi zarokan re çêbikin jî em demeke kin li ba hev in ew tim têra perwerdeyeke mayînde nake. Mixabin niha ji ber Kovîd-19'ê jî em pir kêm tên ba hev. Piranî online xebatan dikin. Loma em pirtir xebatan bi malbatan re dikin. Xebatên çand, huner bi zimanê dayikê bi malbatan re çêbikin. Ji ber ku dema zarokek di malbatê de çi bibihîze, hîs bike li ser wî zimanî bi pêş dikeve. Heke ku nebînin, nebihîzin, hîs nekin ziman di wê malbatê de têk diçe. Jixwe zimanê bi zarokan re nejî, ew ziman mehkûmî mirinê ye. Ziman wekî temenê mirovan e bi me re dijî. Heke em ziman negihînin nifşê nû ew ziman dimire. Armanca me ya yekemîn ev e, geşkirina zimanê kurdî ye, ne rasterast perwedeya kurdî lê geşkirin û hezkirina kurdî ye.

**Çi şert û mercên we yên tevlîbûnê hene, wekî temenê zarokan an jî şertên din, bi gotineke din kî dikare tev li van çalakî û xebatên we bibe?**

Em qet sînorekî wisa danaynin. Her kes dikare tev li xebatên me bibe. Ji 2017'an heta niha ligel ku îsal zêde xebat nehatin kirin jî li gor raporan me xwe gihandiye 12 hezar zarokan. Mînaka me ya herî berbiçav Mihrîcana Zarokan a Sûrê bû ku me wek koordînator organîze kir lê ne tenê em bûn bi me re 17 saziyên Amedê hebûn. Me bi vê xebatê jî xwest, balê bikişînin ser ziman û çanda kurdî. Li ba me sînor tune ne, em vî tiştî qebûl nakin. Mesela sînorên feqîrî û xizaniyê yan dewlemendiyê tune ye yan jî sînorên temen. Me ne ji hêla sosyoekonomîk ne ji hêla cins an temen sînor daneniye di komaleya xwe de.

**Ji bilî xebatên ziman çi xebatên we hene?**

Em bêtir xebatên çandî û hunerî dikin. Me bi projeya biratiya çîrokan dest pê kir ku di erdnîgariya Kurdistanê de gelek gel dijîn wek kurd, suryan, ermenan. Wisa me xebatek pirzimanî dabû ber xwe yanî ya rast em di têkiliyên zarokan de li têkiliyên nerm digerin, helwesta me ev e. Ji ber wê heta niha projeyên berbiçav ev e û xwendina pirtûkan a li ser înternetê û şanoya zarokan a du zaravayî (dimilkî, kurmancî). Me ev şano bi alîkariya Ma Muzîkê û Şanoya Bajêr a Amedê çêkir, a din jî mîrateyên çandî ên cîhanî ye.

Belê rast e em dixwazin zarok li zimanê xwe û neteweya xwe xwedî derkevin û di wê hişmendiyê de bin lê her wiha xebatên me li ser vî tiştî ye ku zarokên me gelên li kêleka xwe û derdora xwe jî bibînin û nas bikin. Yanî li xwe xwedî derkevin, kesayeta xwe, nasnameya xwe nas bikin lê ev xwedîlêderketin nebe înkarkirina çanda gelên li derdorê.



Xebatên me li ser vî tiştî ye ku zarokên me gelên li kêleka xwe û derdora xwe jî bibînin û nas bikin. Yanî li xwe xwedî derkevin, kesayeta xwe, nasnameya xwe nas bikin lê ev xwedîlêderketin nebe înkarkirina çanda gelên li derdorê

**We wek komeleya 'Berî Her Tiştî Zarok' heta niha di çarçoveya mafên zarokan de çi kiriye, çi pêşketinên we hene, der barê vê mijarê de?**

Me mêvandariya muzeya navneteweyî kir li wir jî 2 hezar zarok beşdarî muzîkê bûn. Niha herî dawî jî xebata me ya herî berbiçav ev e, em bi jinan re dixebitin. Me di serî de gotibû ji bo pêşketina zarokan hewcedarî bi pêşketina malbatê heye. Divê xeleka pêşketinê çi be em wê xurt bikin. Derdê me çand be em ê hêla çandî xurt bikin, aborî be em ê hêla aboriyê xurt bikin di malbatê de. Ji ber wê niha projeyek me heye dayik û zarokan bi hev re heye. Bi vî awayî zarok asoya berfireh dikin çîroka dinivîsin.

Proje wisa ye zarok çîrokan diafirînin vedibêjin. Atolyeya çîroknivîsandinê ye. Dayik jî wan karakter û lehengan çêdikin. Zarok jî di wê çîrokê de dilîzin wek karakter.

Niha 9-10 proje li ber qedandinê ne. Dayik ji bo zarokan bi sîxitan pêlîstokan çêdikin. Hem materyal organîk in û zarok wisa hîn dibin ku her tişt ne bi pera ye bi afirandinê jî her tişt dikare bê çêkirin. Nêzî 50 jinan civiyana kolektîf ava kirine bi navê Kollektîfa Jinan a Nefelê. Komele li ser kolektîvîzmê ava dibe.

**Cihê herî zêde ku pêwîstiya zarokan bi van tiştan heye Sûr û Rezan in niha. Saziya we li wir bûya ew ê ne baştir bûya?**

Niha dema ku em tiştekî dikin saziyên Sûrê jî beşdar dibin, em bi hev re dikin. 3-4 komele li Sûrê hene. Berê saziya me li Sûrê hebû. Lê jixwe dema em karekî dikin em li qadeke berfireh dikin. Dema em şanoyekê an mihrîcanekê dikin em li her derê ne. Ne li ser demê ne li ser temen an jî çînekê sînorên me tune ne. Cih ji bo me ne muhîm e. Em ê xwe bigihînin hemû tax û bajaran û mana me ya li taxekê an jî li bajarekî nayê wê wateyê ku dê xebatên me dê di wî bajarî an jî wê taxê de bi sînor bibin.

**Niha bi saziyên din re çi pêwendiyên we yên xebatê hene?**

Niha Ma muzîk û Şanoya Bajêr a Amedê alîkariya me dikin li ser kişandina vîdeoyan û tiştên din. Her wiha malbat jî alîkariya me dikin. Ji ber ku em karekî kolektîf dikin gelek caran em bi van her du saziyan re didin û distînin. Wekî mînak xebatên ku muzîk û stran pêwîst bin em alîkariyê ji saziya Ma Muzîkê dixwazin û ji bo xebatên çîrok û şanoyê jî Şanoya Bajarê a Amedê alîkariya me dike.



## Cewahir Sadak kî ye?



Di sala 1979'an de li gundê Bafê yê Hezexa Şirnexê hatiye dinayayê. Li zanîngehê beşa rêveberiya giştî xwendiye û diya 3 zarokan e. Ji sala 2003'yan heta 2016'an li Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, pêşî wekî gerînendeya karên çand û hunerê û paşê jî wekî seroka daîreya çand û hunerê xebitiye. Niha jî seroka lijneya rêveber a komeleya 'Berî her tiştî zarok' e. Ew jî wekî gelek xebatkarên din ên şaredariyan piştî desteserkirina şaredariyan ji karê xwe hatiye derxistin.

# Rewşa romanên kurdî yên Sovyetê

Şêrko Janzêm

“Kadroyên kurdan ên ewilîn sêwiyên kurd bûn ku ji ber qir û bira salên 1918-1920’an dê û bavên xwe winda kiribûn; di sêwîxaneyan de mezin bûbûn, xwendina xwe ya navîn li wir standibûn.” (r.17) Eskerê Boyîk wiha behsa damezrîner û afirînerên vê edebiyatê dike bê ka di kîjan merhaleyan re derbas bûne. Ji ber wê ye ku ji edebiyata Sovyetê re, ‘edebiyata sêwiyan’ jî tê gotin. Kadroyên wê demê piştî qedandina xwendina xwe, serbestî û azadiya ku rejîma Bolşevîkê dabû gelên kêmjimar qadek li ber kurdên Sovyetê yên xwende vekir. Wan bi paşxaneyeke qels û nekemilandî, dest bi afirandina berhemên edebî kir û gelek cureyên edebî hatin ceribandin.

Di romanên kurdî yên edebiyata Sovyetê de hin xalên hevpar hene ku hin ji wan ev in: Çavkaniya berhemên wan çanda gel, folklor e; di berhemên xwe de pesnê rejîma Bolşevîkê didin; realîzma sosyalîst heye. Guneş Kan der barê romana kurdî ya Sovyetê de wiha dibêje; “Romana kurdî ya Sovyetê encama edebiyateke mêldar e. Di vê edebiyatê de endîşeya polîtîk dikeve pêşiya endîşeyên hunerî yan jî em dikarin bibêjin ku şêwe û hêza edebî di bin siya vegotina îdeolojîk de dimîne.” (r. 65) Wek ku li jorê jî hatiye diyarkirin, di edebiyata Sovyetê de otosansur heye. Ji ber vê yekê di romanên edebiyata Sovyetê de karekterên ji çîna proleter her tim bi ser dikevin.

Romana Kurdê Rêwî jî yek ji wan romanan e ku para xwe ji xalên me li jorê diyarkirine girtiye. Ev roman behsa rewşa kurdan a berî şoreşê dike. Wek gelek romanên wê demê di vê romanê de jî zilm û zordariya beg û axayan, xizanî û belengaziya gundiyan heye. Hîn di destpêka romanê de em dibînin ku Ahmedê kurê Hemîd Beg û Serdarê kurê Keleşê Rîspî li şivanê Hemîd Beg yanî li Keremê lawê Elî dixin. Kerem, ji ber ku dema şivantiya bavê wî guran 50 pezê Hemîd Beg xwarine û piştî demekê bavê wî miriye ew mecbûr dimîne ku di 15 saliya xwe de bibe şivan. Dema em li karekterên romanê binêrin em ê bibînin ku du cure karekter hene. Karekterê neyînî yê temsîla feodalîzmê dike û karekterê erênî yê temsîla bereya Bolşevîkan e. Karekterên neyînî ev in;Hemîd Beg, begê êla Ortila ye ku ew jî mîna gelek beg û axayên dewra xwe zordar û zilimkar e.

Pîr Mîrzo, kesekî oldar e. Li nav gund digere û ji beg re agahiyan berhev dike.

Zînê, qîza Pîr Mîrzo ye mîna bavê xwe di nav gund de tevliheviyê dike. Zînê xwe wek hekîmekê nîşan dide û dibe sedema mirina zarokên gundiyan. Zînê ji ber bêbextiyên xwe nahêle ku miradê Kerem û Zeytûna qîza Hemîd Beg bi hev bibe.

Keleşê Rîspî, alîgirê Hemîd Beg e. Bi çavtengiya xwe û bi xwarina bertîlan ji gundiyan derdikeve pêş.

Kesên din ên neyînî Serdar û Ahmed in ku ew jî li ser rêça bavên xwe dimeşin.

Karekterên erênî; Kerem, şivanê Hemîd Beg e. Ji bo belavbûna fikrên Bolşevîk dixebite.

Zurbe, maldarek e ku alîkariya feqîran dike. Ew jî xebatkarekî bereya şoreşger e.

Hemze, ji ber xebatên fikra şoreşger Hemîd Beg wî dide girtin.

Sûran, kesayetekî ermen e ew jî ji bo belavbûna fikrên şoreşgerî dixebite. Dostê kurdan e jî dema Zurbe mala xwe ji gund bar kir Sûran wî li gundê xwe bi cih kir.

Ûmnov, karekterekî Rûs e karekterê herî bi hêz yê fikra Bolşevîk e.

Ji bilî van karekteran Sebrî, Marûjan, Ûsiv, Şiblî jî karekterên erênî û endamên bereya Bolşevîkê ne.

**Zincîreya rûdanan**

Forster dibêje di navbera çîrok û rûdanan de cudahiyek heye û wiha didomîne: “Çîrok rêzkirina rûdanan a li gor demê ye. Zincîreya rûdanan jî têkiliyeke sedemî di navbera van rûdanan de derdixîne. Em di vê çarçoveyê de li çend mînakan binêrin:

“Wexta pizmamekî yanê jî yekî xêrxaz jê re dipirsî, cîka çima kincê pak wernagre, beşera wî ditemirî, lêvê wî bêhemdê xwe ji hevdû dûr diketin, di nava wan de diranê wî yê zengurî dihatine xanê ewî hezîngek radihîst û digot.” (r. 21 – Kurdê Rêwî)

Di vê beşê de sedema temirîna beşera wî û xemgîniya wî bi pirsa tu çima kincê pak vernagirî re girêdayî ye.

“Hemîd Begê Kerem ji ber miya derxistibû. Ew diçû ber pezê stewr. Usa lazim bû. Mî herro dihatene da’na Kerem dikarîbû Zeytûn bidîta, lê ya pezê stewr başqe bû” (r. 75 h.b)

Di vê beşê de jî sedema şandina Kerem a ber pezê stewr ew e ku Kerem Zeytûnê nebîne.

Di rûdanên Kurdê Rêwî de ev her du mînak du mînakên xweser bûn, lê dema ku meriv li tevahiya romanê dinêre meriv dibîne ku hin rûdanên sereke hene. Mînak: sedema koça êla Ortila talana cerdeyan û hatina eskerê Romê ye. Ev rûdan, rûdaneke giştî ye ku dibe sedema koça êlê. Heke cildê duyem ê vê romanê hatibûya nivîsîn wê ev rûdan zelatir bibûya.

**Hêmanên folklorîk**

Remezan Alan dibêje, “di çanda her neteweyê de folklor heye.” (r. 43 – Keşkûl) Ku em ji vê hevoka Alan bikevin rê û li edebiyatê binêrin, em ê bibînin bê folklor çiqasî tesîr li edebiyatê kiriye. Em Mem û Zîna Ehmedê Xanî wek romaneke manzûm qebûl bikin ku di rojnameya Kurdistan (1898) hejmara 2’yan de wisa tê tarîfkirin, Mem û Zînê jî bingeha xwe ji destana gelerî Memê Alan girtiye. Wê gavê em nikarin peywendiya folklor û edebiyatê her wiha tesîra folklorê ya li edebiyatê piştguh bikin.

Di romanên kurdî yên Sovyetê de gelek aliyên folklorîk hene û bi çanda gel ve girêdayî ne. Gelek romanên wê demê wek romanên gundewar jî tên pênasekirin. Mirov dikare vê şîroveyê jî bike; nivîskarên wê demê, ji hêla edebî û ziman ve xwedî paşxaneyeke qelsbûn. Ji ber vê yekê ye wan jî hem mijarên xwe hem jî vegotina xwe bi hêmanên folklorîk xwedî kirine.

Romana Kurdê Rêwî jî ji ber ku romaneke gundewar e, tê de gelek hêmanên folklorîk hene vebêjerê romanê ji bo vegotina xwe xurt bike îdyom û gotinên pêşiyan bi kar anine. Çend mînak ji îdyom û gotinên pêşiyan ev in :

“Bet çiqas kok dibe, paksa wê ewqasî teng dibe.” (r. 21)

“Mişk çiqas xwelî bikole, wê ewqasî serê xwe ke.” (r. 29 – r. 95)

“Wextê ‘ecelê bizinê tê, diçe nanê şivên dixwe.” (r. 48 – r. 107 – r.183 )

“Çiyayê bilind ji cînarê xirav paktir in.” (r. 53)

“Hewraz tû kim simêl in, berjêr tû kim rû ne.” (r. 56 – r. 96)

“Xwedê berxê nêr daye bona kêrê.” (r. 64- r. 100)

“Him li na’lê dixî him bizmêr.” (r. 69)

“Zikê têr hace zikê birçî tune.” (r. 73)

“Ez bixwazim ez ê ji nêrî gulmastê çêkim.” (r. 80)

“Golkê malê ji gayê malê natirse.” (r. 95- r. 171)

“Se goştê sa naxwin.” (r. 111)

“Dew xwestin kodik veşartin.” (r. 113)

“Giha li ser koka xwe şîn dive.” (r. 141)

“Dê ewladê xwe nas nedikir.” ( r. 145)

“Gunê gurê serê çiya lê dihat.” (r. 193)

Ji bilî vana çend mînakên ‘adetî û çandî jî hene;

“Bavê te wan giliyê te bibhê, poz û guhê te jê ke, te paşopê li kerê siyar ke û nava êla xwe bide gerandinê.” (r. 26) Ev ‘adeteke, dema kesek qebhetekê dike xwediyê wî/ê vî tiştê hanê dike.

“Wextê baranê vekir keskesorê konê xwe yî rengîn vegirt, qîzê biçûk qalmeqal bûn ku herin ser keskesorê re bazdin wekî bivne kur.” (r. 195) Baweriyeke batil e, di nav gel de.

“Çend deqe şûn da li ber derê mala wî êrdek digeriyan, lê ser şêmîkê begdadekî sor, ku li serê darekê av kiribûn dimilmilî, ew nîşana mirina xortê cahil bû.” (r. 197-198) Di vir de jî ‘adeteke ku dema xortek dimir dihate kirin.

“Zînê tu û Mîrzoyê bavê xwe va çi ji rihê min dixwazin, hun çima mina dirya orta Memê û Zînê nahêlin miraz biqedin.” (r. 104) Zeytûn bi vê axaftina xwe bal dikişîne ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî. Heke em li gor van gotinan binêrin em dikarin bibêjin ku hilgirtina navê Zînê ji hêla nivîskar ve ne tesaduf e.

Ji bilî van mînakan ku bingeha xwe ji çanda gel digirin, hin hêmanên folklorîk jî ev in: lîstina kişikê, lêxistina bilûrê, xwestina qîzê, qelen û vegera ji zozanan e.

Her wiha mînakên ji çanda gel a devkî hene:

“Kûra çayê topê Qersê,

Kula kor têkeve da’eta Silê Besê,

Çewa şe’ra min daye ber meqesê…” (r. 27)

Bi van minakan diyar dibe ku romana Kurdê Rêwî ji hêla folklorê ve xwedî paşxaneyeke xurt e. Her wiha ne tenê Kurdê Rêwî gelek romanên wê demê pişta xwe dane çand û ‘adetên gel.

***ÇAVKANÎ***

***ÎBO, S. (2009). Kurdê Rêwî (Çapa Yekem). Stembol: Weşanên Avesta***


***BOYÎK, E. (2019) Çanda Kurdên Sovêtê (Çapa Duyem). Stembol: Weşanên Peywend***

***KAN, G. (2019). Îmaja Ermenî Di Romanên Kurdî Yên Sovyetê de (Çapa Yekem). Stembol: Peywend***

***ALAN, R. (2019). Keşkûl (Çapa Yekem). Stembol: Weşanên Peywend***

***ERGÜN, Z. (2018). Fonksiyonên Hevbeş û Zincîreya Rûdanê di Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê de. e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi Cild: 10 Sayı:3 (21) Sayfa: 805-818***

***FORSTER, Edwerd M.(2011). Romanın Sanatı. Wer.Ünal Aytür. İstanbul: Adam yayınları***
















Amed Tîgrîs

## Axaftina bi zimanê pitik û zarokan

Dê û bav dema zaroka wan dibe, ji dilşadî dest pê dikin bi pitika (bebîsa) xwe re bi zimanê pitikî diaxivin. Ew bawer dikin ku dema mirov bi zimanê pitikî li gel bipeyive baş têdigehe û kêfxweş dibe û zimanê mezinan jî fêm nake. Heçku (halbûku) ev dîtina ha gelek şaş e û heta ji bo perwerdeya pitikan talûke ye. Gelo çima şaş û talûke ye?

Ji ber ku pitik çendek piştî bûyîna xwe dengê dê, bav û ku hebe dengê dadêya xwe nas dike. Dema dengê wan dibihîse dikare serê xwe ber bi wan ve bizivirîne û li gel wan “gixbiv” bike. Pitik dixwaze bala xwe bide ser wan û bala wan jî bikişîne ser xwe. Di vê demê de têkiliya çavan pir girîng e. Pitik êdî dibihîse û dibîne. Deng û dîdariyê di mejiyê xwe de tomar dike. Bi dubare û pirbarekirina peyvan re pitik her çiqas nikaribe bi wan peyvan bipeyive jî, lê demek bi şûn ve têdigehe ka ew tên çi wateyê. Zarok her ku mezin dibe û hejmara peyvên ku hîn dibe jî zêde dibin. Li ku be zimanekî serbixwe hîn dibe. Zimanê pitikî di jiyanê de li pêş hînbûna zimanê dê û bavê dibe asteng û kelemeke demdemî. Mirov dikare bêje zimanê pitikî an jî zarokî çi ye? Baş e, ez çend nimûne li jêr rêz bikim ku mijar baş dîyar û zelal bibe. Di kurdî de ji peyvên zimanê pitikî çend nimûne:

*Emmm (xwarin û vexwarin), nono (nû, xweşik), mîmî (pak, xweşik, dilovan), cîcî (pêleystok, xweşik, kubar), eçî (lêde, lêxe), dîdî (kûçik), tûtû (mirîşk), bobo (ga, çelek), inin (destav), bilobilo (mîz), kix, eyyy (pîs, xerab)…*

Zarok di heman demê de li nav malê ji derî zimanê pitikî dengê gotinên zimanê dê û bavê xwe jî dibihîse. Rastî du zimanan cuda tê. Her ku mezin dibe, vê carê dêûbav dihizirin ku êdî zaroka wan mezin bûye û têdigehe, dest pê dikin bi zimanê xwe li gel dipeyivin. Ew zarok hêdî hêdî zimanê dê û bavê xwe ango zimanekî nû hîn dibe û zimanê dema pitikiyê ku li gel wê dipeyivin ji bîr dike. Mirov dikare bêje ew tê asîmîlekirin. Weke ku hîn ji nû ve ji dayika xwe bibe û ew dest bi zimanekî nû bike. Ji aliyê hînbûna zimanê dêûbavê xwe ve, paşketî dimîne. Ji aliyê sîstem û hejmara peyvan ve jî jar û xizan dikeve. Ev aliyekî neyînî ye ku dêûbav bi zaroka xwe re rasterast bi zimanê xwe napeyivin û bi ziman û îşaretên zimanê pitikî dipeyivin. Aliyê neyînî yê duyem jî ev e ku bi pitikê an zarokê re ne wek temenmezinek dipeyivin. Dêûbav bawer dikin ku zarok mezin bibin jî wek mezinan tênagehîn, divê bi wan re mirov kurt biaxive an jî bi qasî ku ew têdigehîn bipeyive. Ev jî şaşiyeke pir mezin e. Divê mirov bi zarok re wek temenmezinek bipeyive. Ji ber ku ew hem ji aliyê hizir û raman û hem jî ji aliyê ziman û gencîneya peyvan ve bi pêşbikeve û zimanê wî/wê dewlemend bibe. Li welatê pêşketî dema zarokek tê temenê ku here dibistanê 10-12 hezar peyv dizanin, lê li welatê paşvemayî hejmara peyvên ku zarok dizane ji çaran yekê wan welatan hene an na.

Ka em bifikirin du zarokên weha ku hevseng û asta zanîna wan ne wek hev bin û dema ew dest bi dibistanê bikin û di heman polê de bin dê rewşa wan çi be û çawa be? Ji derî vê rewşa ha, heke em rewşa zarokên me kurdan bigirin berçav ku ew ne bi zimanê xwe, bi zimanekî biyanî (tirkî, erebî û farisî) dest bi dibistanê dikin, çi bobelat û karesat tên serê wan? Li welatê xwe bi zimanê bîyanî, bi zarokên bîyanî re heman perwerdê bibîne û bikeve pêşbirika zanîn û jîyanê. Kesî di vê mijarê de heta niha lêkolîneke zanistî nekiriye. Ku kiribe jî min bixwe nedîtiye. Mixabin em pirî caran pesnê xwe û zarokên xwe didin û dibêjin, “em ji tirk, ereb û farisan baştir bi zimanê wan dizanin…” Ev ne rast e û ji derî pesn û fort û zirtan ne tiştek din e. Rast e awerteyî hene, lê ev awerteyî ji sedî çend e, kes nizane. Mixabin li Tirkiyeyê bi hezaran zarokên kurdan nikarin dibistana seretayî tewa bikin.

# ‘Mijar tenê ne nedayîna mûçeyan e’

Navenda Nûçeyan

Rojnamegerê Başûr Dîfaa Herkî têkildarî xwepêşandanên ku bi rojan e li dijî nedayîna mûçe û polîtîkayên hikûmeta başûrê Kurdistanê didomin, axivî û destnîşan kir ku gelê Başûr ne tenê ji bo nedayîna mûçeyan ji ber nebûna azadiyê ya li herêmê jî rabûye ser pêyan

Li başûrê Kurdistanê xwepêşandanên protestoyî di 2’yê kanûnê de li Silêmaniyê dest pê kir. Karmendên ku bi mehan e hikûmeta Başûr mûçeyên wan nedane, nelirêtî û gendeliyan protesto dikin. Xwepêşandanên ku gel bi girseyî tev lê bûye her çû li gelek navçeyên Silêmaniyê belav bûn. Di nav hefteyê de li gelek navçeyên mîna Germiyan, Seyîdsadiq, Kelar, Qeladiz, Çemçemal, Xurmal, Kifrî, Zerayen, Tekye, Pîremegrûn, Şarez û Ranyayê çalakî hatin lidarxistin. Xwepêşanderan avahiyên PDK, YNK, Tevgera Goran û gelek partiyan din şewitandin. Herî dawî li parlamentoya Başûr hin parlamenter jî piştgirî bidin xwepêşandinan li parlamentoyê dest bi grevê kirin.



Xwepêşandanên ku di nav hefteyê de jî domiyan, herî kêm 8 ciwan û zarok ji aliyê hêzên ewlakariya herêmê ve hatin kuştin û her wiha pêşmergeyek jî jiyana xwe ji dest da. Der barê xwepêşandan û rewşa dawî de, rojnamegerê Başûr Dîfaa Herkî ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku gelê Başûr ne dijminê welatê xwe ye, sedema van xwepêşandanan îro tenê birçîbûn, bêkarî, bêzarî û nebûna azadiyê ye.

**Xwepêşandan balav dibin**

Dîfaa Herkî der barê rewşa dawî ya xwepêşandanan de diyar kir ku rewşa niha di asteke xirab de ye, nerazîbûna gel heye, gelê Başûr ji bo vê yekê jî hê bihêrs e û wiha got: “Tevahiya çînên civakê nerazîbûnên xwe tînin ziman. Di desthilatdariya Başûr de ev krîzên ku 29 sal in li başûrê Kurdistanê didomin wisa kiriye ku gel li piraniya bajarên Kurdistanê xwepêşandanan li dar bixe. Niha xwepêşandan li piraniya navçeyên Silêmaniyê didomin. Di van çalakiyan de heta niha herî kêm 8 kes şehîd û nêzî 54 kesî jî birîndar hene. Gelek xwepêşender jî hatine binçavkirin û girtin.”

**Rewşa aboriya Başûr**

Herkî di axaftina xwe de bal kişand ser gotina rayedarekî PDK’ê yê ku xwepêşander wek ‘terorîst’ bi nav kir û wiha domand: “Hin rayedarên PDK’ê ji bo xwepêşanderan dibêjin ‘terorîst’. Bi rastî jî ev ne gotineke di cih de ye. Ji ber ku el ji bo rewşa aborî ya xerab derketiye qadan û mafên xwe dixwazin. Gel îro li Başûr bêkar û birçî ne. Ev nêzî 3-4 meh in xelkê Başûr mûçeyên xwe nestandine. Heta niha li Başûr sê çar mûçe hatine dabeşkirin. Bêrêzî li dayikên şehîdan bêrêzî bi wan tê kirin û zarokên wan birçî ne. Nêzî 300 hezar ciwanên ku zanîngeh qedandine bêkar in. Ev gotinên bi vî rengî yên qirêj û kirêt in. Îro sedema van xwepêşandanan ne birçîbûn tenê, bêkarî, bêzarî û nebûna azadiyê ye. Tu dest li pişt xwepêşandanan tune ye.”

**‘Gel ne dijminê welatê xwe ye’**

Rojnameger Herkî li ser îdiaya hikûmetê ku dibêje li pişt xwepêşandanan hêzên derve hene jî ev tiştan anî ziman: “Ji salên 1993’yan heta niha her dema xwepêşandanek çêdibe, desthilatdara Başûr dibêje ‘destê derve li pişt e’. Yanê cihê ku hikûmet berê xwe bide rastiya gel û xizaniya gel bibîne, berovajiyê vê yekê tevdigere û dibêje xwepêşandan bi destê derve pêk tên. Kes dijminê welatê xwe nîn e, dijminê hikûmeta xwe nîne lê îro gel tenê daxwaza heqê xwe kiriye. Gel ne gotiye ji hikûmetê re ka kompaniyên xwe bide, milk û malê xwe bide! Gel dawa mûçeyên xwe dike, mafê xwe dike.”

**Gel ne azad e**

Herkî der barê sedemên xwepêşandanan de diyar kir ku sedema yekemîn her çiqas krîza aborî û mûçe bin jî di bingehê de hin sedemên din jî hene û wiha pê de çû: “Egera sereke mûçe ne û ligel vê jî hikûmeta Başûr bac û bertîl li ser gel dirust kirin. Di heman demê de heqê gelê Başûr nadinê. Sedema din nebûna azadiyê ye. Li Başûr azadiya rojnamegeran û civakê û hwd. tune ye. Yek ji sedema çalakiyan nebûna edaletê ye, ji ber ku li Başûr edalet nemaye. Başûrê Kurdistanê wekî welatê sîn û çîn lê hatiye. Sedemeke din jî nebûna çaksaziyê ye. Li welatê me çaksazî li tu sazî û cihekî tune ye. Niha pereyên petrolê bi ku ve diçin, pereyên derazingên (deriyê) sînoran bi ku ve diçin gel vê yekê nizane. Ev tev sedemên van xwepêşandanan in.”

**‘Bila hikûmet guh bide gazinên gel’**

Her wiha Herkî da zanîn ku ger hikûmet guhê xwe nede gel û nerezîbûnên gel li ber çavan negire dê her biçe rewş xirabtir bibe, xwepêşandin belavtir bibin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Hewce ye hikûmet li dû gazinên gel here, tişta herî lezgîn were kirin ev yek e. Tu baregeh, avahî û kelûpelên partiyan hindî dilopeke xwîna mirovekî kurdan biqîmet nîn e. Loma jî hewce ye hêzên hikûmet vê tundiya li ser gelê xwe rabike û di demeke kurt de çareseriyekê ji bo daxwazên xwepêşanderan bibîne.”





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Gelê Başûr li ber xwe dide

Mesrûr Barzanî her çendî îro li ser postê serokwezîrtiya başûrê Kurdistanê rûniştibe jî di esasê xwe de qada wî ya pisporiyê ji polîtîkayê zêdetir îstixbarat e. Wî bi salan koordînatoriya rêxistina îstixbarata PDK'ê ya bi navê Parastin kir. Rêxistina Parastin jî di salên 1960'î de bi desteka rejîma Îran û Îsraîlê tê avakirin.

Mersûr Barzanî lîstik, dek û dolab, hîle û fenên taktîkên şerê qirêj in, ne îro roj bi unvana serokwezîrtiyê li dijî PKK’ê û gelê kurd bi kar tîne. Xwepêşandananên li başûrê Kurdistanê yên li dijî gendelî, pergala newekhev û aboriyê didomin. Tevî êrîş û zextên giran jî çalakger di berxwedana xwe de biisrar in.

Tevî hemû zext, êrîş û astengiyên rêvebiriya hikûmetê jî gelek peyamên piştgiriyê ji bo xwepêşanderan tên dayîn. Komek ji 15 parlamenterên parlementoya Kurdistanê ev çend roj in ji bo piştgiriya xwepêşanderan li avahiya parlementoyê dest bi grevê kiriye.

Tevgera Azadî jî bi daxuyaniyekê aşkera kir ku ew piştgiriya xwepêşandanan dikin û got divê gel xwe bi xwe bi rê ve bibe.

Xwepêşandanên heyî û asta çalakiyên hatiyê, bandoreke mezin li ser siyaseta başûrê Kurdistanê jî dike. Hemû kesên alîgirên berjewendiyên gel in, bi şêwazên cuda piştgiriya xwe ji çalakgeran re diyar dikin, lê ev çalakiyên gel ên xwedî maf û hecet îro roj her çiqas gihaştibin asteke girîng û biwate jî di rastiya xwe de bêpêşeng û bêperspektîf e. Gelê herêmê yê ji kevneşopiya berxwedan û têkoşînê tê bi temamî li gor hestên xwe tevdigere û li hemberî neheqiya îro roj li herêmê tê jiyîn, serî hildide.

Bêguman ew baş dizane û dibîne ku kî û çi berpirsê vê bêheqî û newekheviyê ye ku li gel tê ferz kirin. Lewma bêyî guh bide kes an saziyekê li gor derfetê û hebûna xwe daketiye qadan û dengê xwe bilind dike.

Pêwîst e baş bê fêmkirin ku ev çalakiyên bi înîsiyatîfa gel li herêmê bi pêş ketine bi qadekê ango bi bajarekî ve ne sînordar in. Her çi qas adresa ewil a xwepêşandanan bajarê Silêmaniyê be jî li tevahiya başûrê Kurdistanê îro roj çalakî û xwepêşandan hene. Li herêmê di bin kontrola PDK’ê de ne tevî êrîş û qirkirinê hêzên Parastina PDK’ê jî gel li qadan e. Tevî gelek partî û rêxistinên herêmê van çalakiyan wek maf û rewa dibînin jî di serî de PDK û kesên li ser dewlemendiya herêmê pişta xwe payîn kirine, ji bo pêşî li van çalakiyên rewa yên gel bigirin di nav fitneyê de ne.

Serokwezîrê herêmê Mesrûr Barzanî jî bi vê erkê rabûye. Piştî civîna encûmena wezîrên Kurdistanê daxuyanî da çapemeniyê û got: “Divê xwepêşander berê nerazîbûnên xwe bidin Bexdayê.”

Tu serokwezîrê herêmê be, tu li ser hemû dewlemendî û hebûna herêmê rûnê, tu li ser navê gel bi dijminên sedsala yên vî gelî re peymana îmze bike, tu bi pêkanîn û emelê xwe ve pêşî li gendelî û krîzê vebike, tu bibe sedema gel hejar û perîşan bibe, tu hemû hebûna herêmê pêşkeşî neyarên gelên kurd bike û dema gel dengê xwe dike û doza mafê dike, tu bêje berê xwe bidin Bexdayê. Ger ev ne durûtî be çi ye?

Yê bi Bexdayê re li hev kiriye çekdaran dişîne ser gelê Şengalê tu yî; yê bi dewleta tirk re li hev kiriye û axa başûrê Kurdistanê pêşkeşî dewleta tirk kirî tu yî; yê li ser petrol û dewlemendiya herêmê li gor berjewendiyên xwe yên malbatî û hizbî peyman çêkiriye tu yî û tu dibêjî ez ne sûcdar im sûcdar Bexda ye!

Ev kes henekên xwe bi civakê dikin. Li gor van kesan mafê civakê nîne ku li mafê xwe xwedî derkeve ango mafê wan nîne ku ji vê malbata li ser hebûna gelê kurd bûye xwedî hebûn pirsa tiştekî bikin.

Dîsa PDK bi dewleta tirk re bûye yek û ji bo sîxurên MÎT'a tirk bikaribin bi dilê xwe li başûrê Kurdistanê êrîşan pêk bînin, bi nasnameya pêşmergeyan tevdigerin û nuqteyên kontrolê ji bo wan dane avakirin. Li Zînî Wertê, li Garê, li Heftenînê hêzên weke Gulan, Pêşmergeyên Roj, endamên Parastinê ji bo dor li gerîla bigirin erkdar kirin.

Koordînata kampên gerîla dide dewleta tirk û dibin sedema mirina gerîlayan. Pêwîst e PDK bizanibe ku her gerîlayek li ser axa başûrê Kurdistanê bi destê artêşa tirk ve tê şehîdkirin hêrsa gel ya ji bo PDK’ê hîn zêdetir û kûrtir dike.

Heta bi belgeyan derket holê ku serkirdeyên PDK'ê bi dewleta tirk re odeyeke hevbeş a êrîşên li dijî PKK'ê bi rê ve dibe, ava kirine. Ev ode jî bi erêkirina Mesrûr Barzanî ve hatiye avakirin. Hewceyê bibîrxistinê ye ku ji dema Mesrûr Barzanî hatiye ser erkê û şûn ve dewleta tirk li herêmê wisa êrîşên xwe zêde kirine û bûye xwedî derfet.

Yek ji rojeva vê odeya hevbeş jî valakirina wargeha penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî û ji hevbelavkirina hêzên Şengalê YBŞ û YJŞ ye. Ev yek jî asta lîstikên li ser gelê êzidî tên meşandin radixe ber çavan. Dîsa derdikeve holê ku şirîkê veşartî yê peymana di navbera PDK û Bexdayê de hatiye îmzekirin dewleta tirk e.

Xelkê Başûr îro ji bo mafê xwe li qadan e bes serokwezîrekî ku ewqas bi ajandaya dagirkeran re kar dike mimkûn nîn e ku li xelkê jî guhdarî bike.

Li gel ku ji firotina nefta Başûr ji bo Tirkiyeyê bi milyonan dolar pere jî bi dest xistine der barê vî pereyî de agahiyeke ku raya giştî pê tetmîn bibe jî heta niha nedane.

Bi tenê serokwezîr Mesrûr Barzanî îdia dike ku van neft nefirotiye Tirkiyeyê, lê hikûmeta Bexdayê ji ber firotina neftê bo Tirkiyeyê ambargo daniye ser herêmê ku Barzanî ji xelkê re dibêje berê xwe bidin Bexdayê û ji wan bixwazin.

# Li Ruhullah Rem ceza hat birîn




Berdevkê Saziya Dada Îranê Xulam Hisên Îsmaîl ragihand ku ji ber dijberiya li Xwedê cezayê darvekirinê li berpirsê qenala Amadnews a telegramê Ruhulah Rem hatiye birîn û wiha got: "Dîwana Bilind a Îranê ji berî mehekê cezayê darvekirina Ruhula Zem nirxand û niha jî cezayê wî piştrast kir."

Berpirsê qenala Amadnews a telegramê Ruhullah Zem niha li benda înfaza ceza ye.

Berpirsê qenala Amadnews a telegramê Ruhullah Zem hemwelatiyê Fransayê ye. Sala borî serdana bajarê Necef Iraqê kir. Li wir ji aliyê hêzên Îranê ve hate revandin. Piştî lêpirsînê ew şandin dadgehê. Di çarçoveya 'dijberiya li Xwedê' bi 13 sûcan tê sûcdarkirin.

Li dadgehê Berpirsê qelana Amadnews a telegramê Ruhulah Zem sûcdariyên li ser tên ferzkirin red kir û ragihand ku rojnameger e û karê ragihandinê kiriye. ***TEHRAN***

# Hejmara koçber û penaberan zêde bû



Li gorî rapora Komîseriya Bilind a NY'ê ya kar û barên penaberan, hejmara kesên ji ber zordestî, şer û binpêkirinên mafên mirovan ji warê xwe koçber bûne, di destpêka salê de zêdetirî 79 milyon bû. Ev hejmar di nîvê sala 2020'an de zêde bû û ji 80 milyonî derbas kir.

Ji vana 45,7 milyon koçber li hundirê welatê xwe koçî herêmên din bûne; 29,6 milyon penaber neçar mane ji welatê xwe derkevin û 4,2 milyon kes jî daxwaza penaberiyê kirine.

Nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Kar û Barên Penaberan Filippo Grandi bi daxuyaniyekê hişyarî da ku heke rêveberên cîhanê şer nesekinînin, dê rewş xerabtir bibe û wiha got: "Heger şer nesekinînin, aliyên navneteweyî nikarin aştiyê biparêzin. Koçberkirina bi darê zorê, di 10 salên dawî de zêde bû."

Di dewama daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Di sala 2020'an de şerên heyî û herî dawî belavbûna şewba koronayê, bandoreke neyînî li jiyana mirovan kir. Ji ber tundiya li Sûriyeyê, Komara Kongo ya Demokratîk, Mozambîk, Somalî û Yemenê, îsal çalakiyên koçberî û penaberiyê yên nû pêk hatin."

Komîseriyê herî dawî destnîşan kir ku li herêma Berava Navîn a Afrîkayê jî sivîl rastî tundiyeke hov tên. ***CENEVRE***

# Civaka navneteweyî bêdeng e

**Serokê Komîteya Têkbirina Terorê ya Parlamentoya Belçîkayê Kuen Metsu, bi şandeyeke Belçîkayê re serdana Rojava kir. Piştî hevdîtinên şandeyê yên bi Rêveberiya Xweser û MSD'ê re, Metsu diyar kir ku civaka navneteweyî li hemberî Rojava bêdeng e**

Tirkiye li hember Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 9'ê Cotmeha 2019'an de şer dest pê kiribû û li ber çavên hemû cîhanê mafê mirovan binpê kiribû. Ligel hemû binpêkirinên mafan jî civaka navneteweyî pêkanînên dewleta tirk ji nedîtî ve hat. Di êrîşên hêzên girêdayî Tirkiyeyê de bi hezaran kes ji cih û warên xwe koçber bûn û hê jî dibin.

Hefteya borî şandeyeke ji Belçîkayê çû serdana herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Şandeya ji endamên Parlamentoya Yekitiyê Kuen Metsu û George Dalmanî, Gerînendeyê Komeleya Navneteweyî ya Qurbaniyên Terorê Philip Vanstatekiste, endama Komeleyê Rodî Melek, seroka rêveber a şîrketa Child Focus a Piştevanî û Parastina Zarokên Winda û Revandî serdana herêmên kirin. Şandeyê bi Rêveberiya Xweser û berpirsên Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) re civiya. Li gel wê jî serdana gelek saziyên civaka sivîl, kampên penaber û koçberan kirin ku ji ber êrîşên dewleta tirk û hêzên wê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê koçber bûne.

**Sûcên Tirkiyeyê paşguh nekin**

Serokê Komîteya Têkbirina Terorê yê li Parlamentoya Belçîkayê Kuen Metsu, der barê nêzîkatiya civaka navneteweyî de axivî û diyar kir ku dewleta tirk mafên şêniyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê binpê dike û divê civaka navneteweyî aliyekî paşguh neke û îtîrafê li aliyekî din neke.

Kuen Metsu piştî serdana xwe ya li herêmê axivî û qala çavderiyên xwe û bandora êrîşên li herêmê kir. Metsu diyar kir ku divê civaka navneteweyî sînorekî ji van êrîş û xeteriyan re deyne û wiha domand: "Di destpêkê de divê tifaqeke rastîn a navneteweyî hebe ku êdî kiryarên dewleta tirk qe. Ez ê vê di raporê de binivîsim û pêşkêşî hikûmeta xwe bikim. Ji ber êdî ev nayê tehemûlkirin û paşguhkirin. Ev tişt nayê qebûlkirin û me ev tişt di du rojên borî de dît."



**Binpêkirina mafên mirovan**

Metsu aşkera kir ku divê Ewropa itîraf bike ku dewleta tirk kiryarên nerast pêk tîne û Ewropa li ser vê yekê bêdeng e û wiha pê de çû: "Em nikarin çavên xwe ji binpêkirinên dewleta tirk ên li dijî mafên mirovan û binpêkirina serweriya herêmê re bigirin."

**Piştevanî pêwîst e**

Di axaftina xwe de Metsu dilsoziya xwe ji gelên herêmê re bi taybetî ji gelê kurd re nîşan da û piştrast kir ku pêwîst e piştevaniya herêmê ji bo sekna li hember xeteriyan bê kirin û ev tişt anîn ziman: "Neteweya min flamenk e û ji vir ve dilsoziya xwe bi kurdan re nîşan didim. Ji aliyekî ve bi lêz pêwîstiya Rêveberiya Xweser bi parastina nasname û nirxan û her wiha ji aliyê din ve jî bi piştevaniya têkbirina terorê heye."

**'Kurd qehreman in lê belê...'**

Metsu di gotinên xwe de ji DYA'yê xwest ku divê dewleta tirk rêz li sînorên dewletên cîran bigire, hişyar bike û bang li civaka navneteweyî kir ku binpêkirinên dewleta tirk ên li dijî mafên mirovan ên li herêmê pêk tîne, qebûl bike û wiha got: "Ez dizanim kurd qehreman in lê belê pêwîstiya wan bi piştevanî û piştgiriyê heye."

**Koçber dixwazin vegerin**

Serokê Komîteya Têkbirina Terorê yê li Parlamentoya Belçîkayê Kuen Metsu, di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser pêwîstiya vegerandina koçberên li Ewropayê yên bi piştevaniya navneteweyî kir û wiha got: "Min serdana kampa Serêkaniyê kir, li wir zêdetirî 12 hezar koçber ji ereb û kurdên bi zorê ji warên xwe koçber bûne hene. Ew koçber tenê dixwazin vegerin warên xwe, ew jî rewa ye û divê tevahî xebatan li ser vê yekê bikin." ***BRÛKSEL***

# Dê komîte bicihanîna biryarên MSD'ê bişopîne

Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) di 25'ê Mijdarê de Kongreya Niştimanî ya Şêniyên Cizîr û Firatê li dar xistibû. Zêdetirî 300 kesayetên ji seranserê herêmên Sûriyeyê beşdarî kongreyê bûbûn. Kongre piştî lidarxistina 13 panelan li seranserê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên bi armanca naskirina nêrînên aliyên siyasî û şêniyan li ser Rêveberiya Xweser û pêwîstiyên herêmê, pêk hatibû.

Seroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed di hevpeyvînekê de, behsa plan û makenîzmeya xebatên komîteya şopandina biryarên Kongreya Niştimanî ya Şêniyên Cizîr û Firatê kir.

**Komîte hatin avakirin**

Îlham Ehmed diyar kir ku komîteya şopandinê civîna xwe ya yekemîn li dar xistiye û plana pêkanîna biryaran dayî û destnîşan kir ku di radeya yekemîn de rêveberiya xweser ji pêkanîna wan biryaran berpirsiyar e û wiha got: "Komîteya şopandinê ku di kongreyê de hatibû avakirin civîna xwe ya yekemîn 30'yê mijdarê li dar xist. Di civînê de 3 komîte hatin avakirin, erka wan çavdêriya xebatên komîte û desteyên Rêveberiya Xweser e."

**Dê biryarên kongreyê nîqaş bikin**

Ehmed di dewama axaftina xwe da zanîn ku dê Rêveberiya Xweser biryarên ji kongreyê derketine bi hemû dane û pêdiviyên wê nîqaş bike, alternatîfan pêşniyar bike û piştre dest bi pêkanîna wan biryaran bike.

Seroka Desteya Rêveber a MSD`ê Îlham Ehmed destnîşan kir ku hin biryarên wekî yên girêdayî hêzên ewlekariyê, gumrik û hwd. dê di demeke kin de pêk bên. Her wiha diyar kir ku hin pêkanînên biryaran jî hene, yên wekî hilbijartin, amadekariyên wê û xebata ji nû ve sazkirinê, demeke dirêj dixwazin. ***QAMIŞLO***






# Li Maceristanê konferansa Şoreşa Rojava pêkhat

Li Maceristanê di 10'ê kanûnê de bi navê 'Ji Rojava heta Washîngtonê şoreş' konferanseke berfireh a li ser onlîneyê pêk hat.

Di konferansê de Şoreşa Rojava û projeya wê hat vegotin. Şoreşa Rojava ku weke projeyeke civakî ya çepgir û femînîst a li dijî kapîtalîzmê û baviksalariyê tê dîtin, weke 'halê hazir alternatîfa herî xurt a çepgir û dij-kapîtalîst e' hat nirxandin.

Li gorî pêşkêşkirina bernameyê di konferansê de hem ev şoreş û hem jî rewşa berdest a herêmê hat pênasekirin, analîzkirin û pêla şoreşê ku projeya Rojava rê lê vekiriye hat destnîşankirin. Di vê çarçoveyê de tevgerên girseyî û şoreşgerî yên van salên dawî yên wek Sûdan, Şîlî, Îran, Cezayîr, Fransa, Haîtî û Libnanê hatin nirxandin.

Sernavên konferansê: 'Îdeolojî û siyaseta Rojava', 'Rewşa siyasî ya rojane', 'Paradîgmaya Rojava ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan', 'Rojava û guherîna avhewayê', 'Jinên kurd', 'Konfederalîzma demokratîk', 'Jineolojî', 'Ekolojiya civakî û teoriya femînîst', 'Krîza global û pêla serdema nû', 'Li DYA'yê tevgerên anarşîst', 'Ji Îranê heta Şîliyê tevgerên civakî', 'Ewropaya rojhilat û şaredarî', 'Li YE'yê di asta şaredariyê de lîveyên avakirina polîtîkayan', 'Krîza Belarûsê', 'Çima sosyalîzm', 'Li Rojava konfederalîzma demokratîk'.

Bernameya konferansê bi zimanê macarî û îngilîzî hat pêşkêşkirin. ***BUDAPEŞTE***

# Rewşa zarokan di pandemiyê de [1]

Cemîl Guneş

Nexweşî hat û em ketin nav çar dîwarên mala xwe. Jiyana me wek çend salan carekê ji nû ve dîzayn dibe. Em her tim gilî gazinan dikin ku em ê çawa li hundirê malê bistirin. Gelo zarokên ku li derve jî nastirin, dê li malê çawa bistirin?

Çend salan carekê bi navê nexweşiyên ecêb qira mirovan tê. Rojê bi hezaran mirov ji ber van nexweşîyan jiyana xwe ji dest didin, lê ev jî heye ku mixabin bi hezaran sal in li welatê me xwîn her diherike. Ji ber qewimînan ji bo ku em jiyana xwe bidomînin û li pêşiya xwe binêrin her tim hewce ye ku em alternatîfan bibînin. Hingî tişt diguherin carinan hewce ye ku em alternatîfên alternatîfan jî peyda bikin ku em li xwe neheyirin.

Wek tê zanîn ev çend meh in dîsa nexweşîyek li me hatiye xezebê û ji gelek aliyan ve xisarên mezin dide me. Ji aliyê aborî, derûnî, malbatî, kar, xwendin û hwd. Wisa xuya dibe ku ev nexweşî dê heta demeke dirêj bidome. Her wiha bandora vê nexweşiyê bêguman dê ji nexweşiyê zêdetir jî bidome. Belkî bi salan û belkî jî bi deh salan… Ango ji bo gelek tişt wek berê bibin pêdiviya me bi demeke dirêj û kar û xebatên xurt hene.

Bêguman her kesî para xwe ji nexweşiyê yan jî ji bandora nexweşiyê girt, lê bi min wek her qewimînê, vê nexweşiyê jî bandora xwe herî zêde li zarokan kiriye. Erê, qala wan zarokan dikim ku bi qasî derfetên heyî hebûn û erê ew zarokên ku ligel ew qas zehmetiyan pakiya xwe diparastin. Bi dilekî rehet dikarim bibêjim ku bandora vê nexweşiyê zêdetir jî li zarokên kurdan bûye. Jixwe ev zarok ji zayîna xwe heta mezinbûna xwe, her tim û li her qadên jîyanê rastî pirsgirêkan dihatin, vê nexweşiyê jî ev pirsgirêk kir guloka pirsgirêkan û derket pêşiya me. Hewce ye vêya jî bibêjim. Zêdetir jî zarokên li bajar û metropolan dijîn bi van pirsgirêkan rûbirû dimînin. Çimkî zarokên gundan belkî tenê ji aliyê perwerdeyê ve rastî pirsgrêkan tên lê ji aliyê gelek tiştên din ve jiyana wan asayî ye li gor jiyana bajaran. Dibe ku ev zarok bêyî perwerdeya ku li wan tên ferzkirin baştir û serkeftîtir jî bibin. Ev mijareke din e.

Wek min got, jixwe heta niha me çavên xwe ji pirsgirêkên heyî yên van zarokên xwe girtin. Mîna em neçar man û wan bişînin perwerdeya bi zimanekî din, ne şevbuhêrk man ku em qala çîrokan ji wan re bikin, ne wek berê ceyran diçe ku em li ber sobeya êzingan lukusekê vekin û çîrçîrokan ji hevdu re bibêjin; ne ax ma ku li ser lîstikan bilîzin, ne av ma ku dilê wan coş bibe, ne berf dibare ku di nav de xwe zîz bikin û ne dar ma ku rapelikin li ser û fêkiyan jê bixwin… wisa xuya ye ku em ê niha jî çavên xwe ji wan re bigirin û ji derdê wan re nebin derman. Divê neyê jibîrkirin ku ew roniya çavên me û her wiha parêzvanên herî xurt yê xweşî, başî, çand, huner, ax, welat û zimanê me ne. Loma ew şensê me tune ye ku em îjar çavên xwe li wan bigirin û divê em guhê xwe bidin wan, çavên xwe li wan vekin, bi destê wan bigirin û derfetên heyî bikin qurbana wan. Yan na dê nifşek ji kîsê me here. Ku nifşek ji kîsê me here, ka bifikirin bi wê nifşê re em ê hîn ji çi bibin? Nexwe divê em çi bikin? Bi rastî jî heke derdê wan û dermanlêkirin xema me be, rehet e. Ka em pêşî li derdên xwe baş binêrin.

Nexweşî hat û em ketin nav çar dîwarên mala xwe. Jiyana me wek çend salan carekê ji nû ve dîzayn dibe. Em her tim gilî gazinan dikin ku em ê çawa li hundirê malê bistirin. Gelo dê neyê pirsîn, ka ev zarokên ku li derve jî nastirin, dê li malê çawa bistirin? Helbet ji bo zarokan mayîna li malê zehmettir e. Her wiha mayîna li malê ya zarokan ji bo malbatan jî zehmettir e. Em mezin jixwe bi derdê dinyayê ketine û nastirin û tew zarokên netebitî jî li malê asê man! Tiştekî din jî heye. Ev zarok êdî nikarin herin dibistanê jî, gelo ew ê halê wan çawa be? Heke dêûbav û malbat bixwazin dikarin vî derdî veguherînin dermanekî xweş. Werin em dev ji perwerdeya online û ji nîqaşên wê berdin jixwe zarok li ber van ekranan dîn bûn. Ji dêvla ku bi saetan li ber van ekranan bimînin, em bi zimanê wan mala xwe ji wan re bikin xaneke bextewar da ku ji vê pêvajoya nexweşiyê sûdê werbigirin û jiyana xwe rengîntir bikin. Jixwe zarokek di polê de ji nîv saetî zêdetir nikarin bala xwe bidin dersê û jê qut dibin. Perwerdeya online jî wisa ye. Zarok zêdetirî xwe li ber ekranê bimînin, mejî pûç dibe û ew xeyalên zarokên me yên rengîn tev ber li ber avê diçin.

Nexwe heq e ku em bipirsin: Divê em çi bikin? Wek destpêka her tiştî ji bo destpêka vê pêvajoyê jî naskirin hewce ye. Divê dêûbav pêşî zarokên xwe baş nas bikin. Çimkî gelek dêûbav ji huner, qelsî û pêdiviyên zarokên xwe bêhay in. Divê bizanibin bê ka zarokên wan ji kîjan alî ve baş in, ji kîjan alî ve qels in. Armanc naskirina zarok e û amûr jî lîstik in. Em dîsa bi bîr bînin û dubare bikin. Zarok zêdetirî nîv saetî nikarin bala xwe bidin dersê û nikarin li ser ekranê hîn bibin. Her kes baş dizane, zarok bi saeatan dikarin bilîzin. Nexwe em ê bi rêya lîstikan hem zarokên xwe perwerde bikin hem jî mala xwe geş bikin. Lîstik ne tenê ew tişt in ku mirov pê wextê xwe derbas bike û bikene. Lîstik wê fersenda hevnasînê, pêşveçûnê, kêfê û heyecanê dide mirovan. Her wiha derheqê çand û hunera cihekî jî agahiyan jî dide mirovan. Ji ber ku dê mekan mal be, helbet hewce ye ku lîstikên nav malê hebin. Ev lîstik ne tenê ji bo zarokan e, divê neyê jibîrkirin ku lîstin û heyecan pêdiviya her ferdî ye. Bêguman bi van lîstikan dê kesên malbatê hevdu baştir nas bikin û dibe ku ev rêya serkeftinê ya malbatê tevan vebike.



# Koleyê ku dilê xwe dibijîne efendiyê xwe



Seyidxan Anter

Van rojan sedsaliya Apê Mûsa (Mûsa Anter) di rojeva kurdan de ye, tê pîrozkirin, xelat tên belavkirin û di derheqê wî, malbat û derdora wî de ji her caran bêhtir gelek tişt têne gotin. Di vê navê re hin xalên şaş û nerast jî derketine ser şiverêya me.

Di nav "xwende" û "maqûlan" de rutba muxtariyê bilind dixuyê. Di vî warî de ciwamêran li gor gaza xwe cav dipîvin û muxtariya Fesla Anter derdixin pêş. Di masmedyayê de, wêneyek belav bûye. Li jora wêne wiha nivîsiye, 'Turkiyenin ilk kadin muhtari Fesla Anter' ango 'Muxtara jin a yekemîn a Tirkiyeyê'.

Gelek huner û wesfên Fesla qîza Hisênê Sarê yê Kanîşêxî û bi gotina xelkê XATÛN hebûn:

•Çav derman dikirin. Nemaze havînan ku di germayiya çaxê paleya bidas û qeynaxan û dura jî cencera benderan re, çavên gelek mezin û zarokan kul dibûn. Dermanê Fesla Anter şekirê kabik û merhem tanî ku layê wê Mûsa Anter jê re bixwe.

•Zarokên ku germa bedena wan zêde bilind dibû, dikirin nav pelên dara0 bîhê, ew dikirin hêlanê takû têr xwê didan. Zarok dişûştin, qenc zuha dikirin û ew dişandin mala wan. Bi vî rengî gelek zarok ji mirinê azad kirine.

•Çariya wê ji agir û xweliya cixarê qulqulî bû. Tûtina kê diqediya, qutiya xwe dişandin nik Xatûnê.

•Odeya wê ji mêvanên licî, omerî, selhî û berîvanyan bi şevbuhêrkan û deng û ribaba Miheme Eliyê mala Kinê ve digeriya. Xelkê ji gundên din dihatin û bi pêşbirka HUNGILÎSKê -dersa demokrasiya nav kurdan- dilîstin. Ji gundên Omeriya xelkê fêkî tanîn û zad dibirin.

•Bi çîrok, serpêhatî û tahnên xwe ve her tim bala me li wê bû.

Me li jor bahsa weneyekî kir ku wek Fesla Anter bi nav kirine. Naxêr ya di wêne de ne Fesla Anter e, lê xwişka wê ya ji Girmasekê, Sara ye. Li Zivinga Temikan, bi muxtarê beriya anha ve kêla gora Fesla Anter a bi kurdî rakirine û bi zimanê tirkî û slogana muxtariyê, kêla gora wê guhertine. Hevoka 'Turkiyenin ilk kadın muhtari Fesla Anter', wirde wirde dibe slogan û ev slogan rengê 'Koleyê ku hez ji efendiyê xwe bike' distîne. Hoya muxtariya Xatûn, mîna ku Apê Musa dibêje; ji ber ku çi mêr li Zivingê nemabûn. An na, Fesla Anter li ku û muxtarî li ku! Lewra wê ji Enqereyê hez nedikir.

Hey me dest pê kiriye em qenc bidin nav. Fesla Anter sermiyantiya mala xwe û gundê xwe dikir. Jiyan û serpêhatiyên wê, di serdemeke taybet a siyasî û civakî de rûdane. Wê demê li derveyî bajaran pêwendiyên feodalî desteser in. Kontorola TC'ê ya wek van rojên em tê de ne li deşt û zozanên bakurê Kurdistanê hîn çênebûye.

Rê bidin min ez rastiyeke di nav kurdan de bi bîr bînim. Gelek malbat ne bi bav lê bi dê navê wan hatiye hildan. Bala xwe bidinê ji malbata dê û bavê Fesla Anter re jî Mala Sarê dibêjin. Kara Fatma ya ji Elbistanê û ji eşîra sinemilli, li hespa xwe siwar, şervanên wê pê re diçin heta Stenbolê nik siltanê Ottomanî bixwe jî jinek kurd e.

Bêguman rola jinê ya me li jor hinekî vegot, pişta xwe dide rabirdûyeke dîrokî. Sosyologê Alman Augut Bebel, di berhema xwe ya bi navê 'Kvinan och socialismen' (Jin û Sosyalîzm) de ev aliyê jina kurd destnîşan kiriye. Di ansîklopediya Siwêdî ya despêka salên 1900'an behsa otorîteya jina kurd dike. Alexandra Kolantay di pirtûka xwe 'Kvinnans ställning…' de wilo dibêje: "Li nik kurdan ku qewmek kaukas in, jin bi çelengiya xwe tê nasîn û di çeperan de beşdarî şer bûne."

Îca dema ku jinên Nisêbînê, Batmanê, Kobanê û bajarên din yên kurdistanê dibêjin: EM NE NAMÛSA Çi KESÎ NE, AZADIYA ME NAMÛSA ME YE! Wa xuya ye ku haya wan ji Fesla Anter û tradîsyona serfiraz a jina kurd heye.



*Fesla Anter (ji destê rastê ve ya duduyan) bi bûkên xwe Hesîna, Hale û qîza xwe Wetha û neviyên xwe Reşê, Anter, Seyidxan û Dîcle re. Ev wêne sala 1954'an li gundê Sitilîlê hatiye girtin.*

# Wextê peynîardişê şîdetî ameyo

Helîn Uzel

Vakure Kurdistanî de seba ke şaro kurd bê îrade, bê çand û bê exlaq bibo hetê dewlete ra polîtîkayê taybet êy çonkdayîşî yenê rayîraberdene. Nê polîtîkayan de bi taybet cinîyê ciwan yenê hedefgirewtene. Na yew bi rayirê hêzê xo yê taybetî kenê. Vernî de êrîşê bedenê cinîyan kenê, bedenê cinîyan roşenê û onûrê civatî binling kenê. Bi destê dewlete, bi ercê exlaqî yeno kayekerdiş. Yeno zanayiş ke heke cinî exlaqê civatî nêpawa do civat nêmano û çinê bibo. Ay semed ra êrîş kenê. Badê serranê 1978ine nê êrîşî bi taybet Kurdistan de dest pêkerdî. Çimkî dîyê ke şaro kurd reyna ganî beno. Bi taybet dima ke AKP ame îqtîdarî ser, nê êrîşî verva cinîyan zêdîyayî. Raybazanê çonkdayîşî êy dewlete ra yew zî tecawiz o. Dewleta tirk şexsê cinîyan de şaro kurdî rê qirkerdiş ferz kena.

**Polîtîkayê taybet êy çonkdayîşî**

Verva nê êrîşî xeylê tekoşîn ame dayene. La çi heyfo ke hama zî xeylê cinîye ciwan estê ke tekoşînî ra dûrî yê. Mînak, Batman de Îpek Ere hetê eskerê dewlete ra ameye tecawizkerdiş, Gulîstan Dokuye hema hema nêzdîyê serrîyêk o Dêrsim de vînîbîyayeya. Reyna waya Mutlu Kaya ke encamê êrîşê yew camêrdî de bi giranî dirbetin bî, Dîlek Kaya Amed de hetê embazê xo yo esker ra ameye qetilkerdene.

Nê polîtîkayê taybetî êy dewlete, vakûrê Kurdistanî de her roja ke şona vila benê. Destê qilêrin serê cinîyan de yê. Zê ke şîdet, tecawiz û kiştiş bes nîyo, dewlete cinîyan rê cuwîyek merde dana cuwîyayîş û zê objeyek cinsî verkêş kena.

Vakûre Kurdistanî de êdî fuhuş zêdîyayo. Bi ewnayîşeko teng êy namûsî, wazenê cinîyan şenik bikerê. Cinîya ke fuhuş kena ya yena kiştiş ya zî bena koleya dewlete. Keleka tecawizkerdişî, mergî bi guman zî rojdeme de yê. Hewl danê mergê cinîyê ke ver bi mergî yenê şirawitiş û yenê qetilkerdiş, zê 'întixar' binawnê. Kiştox, êrîş û tecawizkarî nînê cezakerdiş û bi fermanê selahîyetdaran hereket kenê.

Bi verkeşîya têkoşînî, cinîyê kurd verva nê polîtîkayan xeylê xebatî rayîr benê û polîtîkayê taybetî vero vecîyenê.

Hemeyê dinya de verva cinîyan şerêko taybet ameyo îlankerdene û yeno rayiraberdene. Asta şîdetî tewr berz de ya. Zê ke ma vernî de vatbî, bingehê şîdetî hişmedîya bawiksalan de yo. Cinîyî zê male xo veyneno yo. Bi verkeşîya têkoşînî, cinîyê kurd verva nê polîtîkayan xeylê xebatî rayîr benê û polîtîkayê taybetî vero vecîyenê. Çimkî ma cinîyî êdî nêeşkenê bi şîdeto ke her roje ma kêm keno û bê nefes verdeno reyde bicuwîye. Êdî bes o, wextê peynîardişê şîdetî camîrdî ameyo.

**Ma do na yew senîn bikerê?**

Bi avervistîjê pawitişê cewherî, bi tekoşîn! Çar perçeyê Kurdistanî de cinîyê kurd birayvistin bîyê û verva şîdetî bawiksalan û dewlete, xopawitişê cewherî aver vistî. Çimkî dewlet kiştox û êrîşkaran pawena. Merdim nêeşkeno bawerîya xo bi dewlete bîyara. Tewr peyên ma na yew qewimîyayîşê Îpek Ere de dî. Coka rayîrê bipeynî ardişê şîdetî, qerardarîya cinî û hêzê aye êy xopawitişî yo. Lazimo ma vernî de xo perwerde bikerê û dima ra zî dormeyê xo rayvistin bikerê. Çonkdayîş nê, xoverdayîş lazim o. Êdî verva qirkerdişan wextê pawitişê cinîyan û civatêk azad o!



# Koronavîrus, kolonyalîzm û ekolojî

Mehmet Seyîtalîoglu

Koronavîrus, krîzê mentiqê kolonyalîzm û mentiqê ekolojîyî de xo dano teber. No vîrus ma xurafeyan û zuran ra û sanikan ra xelesneno û naskerdena çêberê hêqiqêtî dîyayiş de raye dano ke, ma çimanê xo akîme. Kultûrê bawêrî xeta îlmî ra eke bivisnî, keweno raya tarîye.

Xurtbîyayîşê îlmî, hetê ra tay dîndarî ke nêvurîyayîş de rike kenê û cayê xo ra ciniqînê we. Na raya ke pê girewta, qayt kenê ke raya kora. O taw paştî çarnenê kîlise û sînagog û camîyan û mescîdan nê cayanê îbadetan ra fek vere danê û mifte nanê pa. Cadeyî û rayî û sirbî û AVMî û kêberî mifteyî nayî ser. Ê reîsê xurtî nêasenê, saraya xo ra nêvejîyenê teber.

Bêguman îlîmdarî vîrusî rê derman doz kenê. La şîrkêtî keşifanê neweyan seba kar û qezencê xo şarî ra danê we. Eşkera nêkenê. Nê dermanî sifte bi şîrketê xo pîyasa de ca gênê. Verê qezencî ebe nê qeydeyî çarneno ra xo.

Şîrketî dermanan seba rotena pîyasa û karê xo ser o fikirênê. Nêweşî muşterî yê, dermanan ebe çimê eşyayê karî de vînenê. Mentiqê maldaran tim û tim nîya şuxulêno. Covîd-19 heyatî rijneno. Krîzê ewroyî kêberî xo ser o cadayîş o.

Merdimî tebietî rê deyndar ê. Aqilê tebîetî yo ke ma vanîme, vurnayîş, têmîyankewtiş roj bi roj îflas kerd. Maldaran seba dewletîya xo tebîet talan kerd. Na raye xirabîya ra agêrayîş mumkin nîyo. Armancê merdimî, tebîet de ebe aştî, têhetî û têduştî de ciwîyayîş o. Gere tebîetî de hemver bîme. Tey de ceng nêkîme. Tebîet, merdim û kultur nê heme hîrê yew ê.

Serra ke şîye, ez şibîya Dersîm.

Çend cayan ra fetelîyayîme. Ma qalê tebîet û bawerîya xo ya elewîye kenîme. Muhabet xeylê bî derg. Der û dormeyê ma bî pirrê însanan. Werteyê însan ra pîrêde kalî, ma ke qalê na xirabîye kerd ma ra vat;

"Ero babaw o, çol û çolistan ra maro rut û vergo vêşan kî ma ra yeno perskerdene". Na vaten ser o êdî zonê ma nêgêra. Ma lew na destê kalî ro, şana raye. Çimke nê cumleyê pîrikî armancê ma ebe kilmkî ardbî zon.

Naye ra davîst serran ra ver Amed de muzeya Cahît Sitki Tarancîyî de bi nameyê ''Tarîxê Amedî'' yew kitab kewt mi dest. Çend rojî tê dima ez şîya uca û mi no kitab wend.

Mi aqil de henî mendo. No kitab serra hezar û heşt sey û hîrisê heştî de (1838) ebe alfabeya erebkî ameyo çapkerdene. Demê ra dime ebe alfabeya latînkî çap bîyo. Çunke mi ebe nê qeydeyî wendbî. Îdareyî ê tawî kitabî nêdayêne teber. Ez kî çend rojî tê dima şîya mi wend û xelesna.

O taw Bexdadî ra seydwanî ameyî deşta Heranî, şêr û pilingî pê girewtî û seyd kerdo. Nê kitabî de defina qalê raya Amed û Sîweregî kerdo. Heştay karkerî ju mewsîm xebitîyayî. Raye dar û berê birrî ra kerdo pa.

Na vatene ma rê sey xem û xeyal a, sey zure yena. Çunke di sey serr de hende tehrîbat, rijnayîş û xirabîye arda tebîetî ser o. Însan xeyal nêkeno.

Na vatena dima qaytê Covîd-19î keno, qet çî nîyo. Çunke ma însanan tebîetî rê hendê zilm kerdo ke qalê covîdî nêbeno.





Dewey Ma
Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## 4 pîrekî

Pîrek ya zî mêrde, qet muhîm nîyo, kam zêde kede bido û keda cê/cay serkewte bo hurmet vîneno/a. La ma ene nişte de verê xo bidê dinya de 4 pîrekanê serkewteyan.

**Jacinda Ardern**

Jacinda Ardern Serokwezîra Zelandaya Newî ya. Serra 1980'an de Hamilton de hamiya dinya. Ardern serra 2017'an de wexto bi koalîsyon hukmat viraşt û bî Serokwezîra Zelandaya Newe 31 serrî bî. Partîya ci 46 kursî girotîbî. Emsar, 17'ê aşma 10. de reyna Zelandaya Newî de weçînayîş bîbî û partîya ci Partîya Karkeran 120 kursî (sera 46) girote û tena serê xo bî desthilatdar. Eno 24 serrî yo ke Zelandaya Newî bi koalîsyonan raver şona, la Arderne dewran bedelna.

Partî demê xo yê desthilatdarî de qeybî şarî xebetîya, welatê xo raver berde, demê pandemî de zî bî welato ke ci de tewr tay merdimî mirenê û hetê aborî de zî rewşa înan baş a. Şarê Zelandaya Newî bi reyanê zêde xelate da Arderne.

Kovara Time ke her serre lîsteya "Dinya de 100 Tenê bi Bandor" virazena, Jacinda Arden zî kerde miyanê lîseya xo ya serra 2019an.

**Sanna Marin**

Sanna Marin Serokwezîra Fînlandîya ya. Serra 1985'an de Helsînkî de hamiya dinya. A 10'ê aşma 12. ya 2019'an de biya Serokwezîra welatî. Miyanê welatî de şar ayra hes keno. Marin bi ciwaniyey xo, bi kar û xebatanê xo zî yena heskerdiş. Emsar 23 û 24'ê aşma 8. de kongreya partîya ci Partîya Sosyal Demokratan virazîya. Kongre de Marine zî xeber da û vat; "Ma vîzyonêk virazê ke Fînlandîya senî biba wayîrê xebatêk baş. Ma sero xebetîyenê ke saetanê xebate 8 saetan ra bifînê 6 saetan."

Dinyaya ke zehf welatan de demê xebate 8 saetîyo, zehf welatanê bînan de 8 saetan zêdetir merdimî xebetênê de a vana ma demê xebate bifînê 6 saetan. Ma ene game qeymî dinya zehf başe niya? Ger beşkê ana bikerê go qeybî dinya zî nêbe nimûne?


**Angela Merkel**

Angela Merkel Serokwezîra Almanya ya, bi vatişê înan Şansolye ya. A serra 1954'an de hamiya dinya. Merkel zî qeybî ene joy miya meymanê ma: 22'ê aşma 11. ya emsarî de, yanê aşmêk verî bî 15 serrî ke Şansolye ya. Enî 15 serran de aye welatê xo raver berd. Aborî welatê xo raver berde. Butçeya înan ya serra 2019'in zêde veciya. Demê pandemî de miyanê welatanê Ewropa de Almanya, bî welata ke eşka baş xover bida û zehf zirar nêvîna. Pîrekêke 15 serrî qeybî welatêke pîl zey Almanya şansolyetî kena û serkewte ya. Bi ene joy heq kena ke tîya ca bigîra.

**Gulten Kişanak**

Û Gulten Kişanake. Meymana ma ya peyîne Gultan Kişanake ya. Kişanake serra 1961'in de Elezîz de hamiya dinya. Wextê Derbeya 12'ê Êlone de binê îşkencî de xover da ya. Rojnameyanê kurdan Yenî Ulke, Ozgur Gundem de kar kerda. Dimara serra 2007'in de Amed ra biya mebûse. Serra 2009'in de tewrê Selahattin Demîrtaşî biyê Hemserekê BDP'yî. Serra 2011'in de nawey Sêrt ra biya mebûse û serra 2014'in de a û Firat Anli biyê Hemşaredarê Bajarê Pîlî yê Amedî. Kişanake wexto ke hemşaredare bî va, "Batman de petrol yeno vetiş, la perey petrolî qeybî herême nîno xebetnayiş. Çi rê? Ma barey xo enî petrolî ra wazenê." Û dewlete va etiya ez biryar dana û a eşte heps. Erê hema zî heps de wa la giraniya ci zî nêbena vinî.

Ardene Sereka Partîya Karkeran a, Marin Sereka Partîya Sosyal Demokratan a, Merkel ciwanî xo de miyanê çepgiran de xebetiya wa, Kişanake zî wayîrê fikrê çepîtiya. Eno het ro fikrê înan zî kunê serê yew xetî.Erê, mimkûn o weko bîn zî pîrekê serkewte bibê, la ma miyanê înan ra 4 pîrekê serkewteyan weçîna. Îdare bikerê. Ma hêvî bikerin go hûmara pîrekanê serkewteya biba zehf û go dinya bi înan bixemeliya.




# Tiştanok (mamik)



**1-** Mamê mino mamanî
Sindoq li ser sindoqê
Mifte li destê bûkê

**2-** Mamê mino mamanî
Serî text
Binî text
Tê de dijî kalekî bêbext

**3-** Mamê mino mamanî
Ser mazî
Stû derzî
Li diyara dike gazî

***Çavkanî: Riza Uyar***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van mamikan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin.

**Bersivên me ev in:**

**1- Desta 2- Kosî 3- Kew**

# Zûgotinok

Çaxê we bi xêr hevalno. Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par vebikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Îsiv mamê îsiv**
**Îşev serê sê sêşema**
**Ez ketime cem te**
**Tovê sê mişar sîr**
**Ez pê hewce me**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Jajiya şûziya şor e**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev bibe:
**Ji vê havînê**
**Heta wê havîne**
**Dirisîne cila mihînê**

***Çavkanî: Pitrûka Zûgotinok a bi berhevkariya Mihemedê Kurdo***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Parçe, qisim 3. Ji nişkan ve 5. Meheke biharê 6. Cot, zo
7. Şîş 9. Bajarekî bakurê Kurdistanê
12. Mafdar, heq 14. Cînavkeke pirsiyariyê
15. Sewala ku deqek di eniya wê de ye
17. Dirb 18. Tûj
22. Aşiq, hezkirî

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Xerac, pereyê ji mirovan tê standin
2. Şîret, nesîhet, tewsiye
3. Agir 4. Roja hefteyê
5. Sembola berxwedana Kobanî
7. Çax, dem, heyam, wext, zeman
8. Razan
10. Ji niha şûn de
11. Bawerî
13. Nalîn
14. Koma bazirganên gerok ên heyama berê
16. Meheke salê
19. Beşeke malê
20. Zeviya ku tê avdan, ne bejî
21. Hinav
23. Noteke muzîkê

Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 G | U | 2 R | | | | | | 3 Z | Î | 4 N | |
| O | | A | | | 5 D | I | D | O | | O | |
| 6 R | Ê | S | Î | | Û | | | | | | |
| | | E | | | R | | 7 H | Ê | 8 K | | |
| 9 X | 10 E | R | Î | 11 B | Î | | E | | Ê | | |
| | R | | | I | | | 12 K | E | R | 13 Î | |
| 14 D | Ê | | | R | | | A | | | S | |
| E | | | 15 B | A | 16 J | A | R | Î | | A | |
| 17 R | Ê | | | | Î | | Î | | | 18 L | 19 Ê |
| W | | | 20 Z | | J | | | 21 M | | | D |
| Ê | | 22 G | E | R | O | 23 K | T | Î | | | Î |
| Ş | | | R | | | A | | | | | |

Adil başaran

# Rovî û dîkê Xursê

Valakirina gundan, ne tenê zirar da gundiyan, hemû ajal û teyr û teba jî para xwe jê girtin. Ji ajalan yê herî zêde ji valakirina gundan zirar dît rovî bû. Binêre bê çi tê serê roviyê zana.

Rovî her tim û dayîm di nav kêf û xweşiyê de bû. Dema birçî dibû, diçû bi dora şivan û gavanan diket û erzaqê xwe temîn dikir. Di nav bax û baxçeyan de çi fêkiyên ewil derdiket wî berî xwedî dixwar. Dema zayîna pez û bizinan, bi xwarina pizanan qelew dibû û pirçika wî bi çar tiliyan dirêj dibû. Xwe di ser keyayê heft gundên Xursê re didît. Şivan û gavanên gund bi tiştekî nedihesibandin, jixwe axayê hemû gundên xursiyan bû. (yanî xwe wiha didît) Piştî ku gund ji aliyê leşkeran ve hatin şewitandin û valakirin, rovî birçî û tazî dimîne. Digere nagere nema li der û dorê tiştekî dibîne. Ne şivan û pez; ne gavan û naxir; ne dengê elok û mirîşkan û ne dengê dîk çêlikan... rovî nema zane çi qewimiye.

Rojekê rovî debara wî hew ji birçîna tê, ji birçîna zikê wî dike qûreqûr. Difikire û dibêje ez ê herim gundê Xursê. Berê xwe dide nav gund û diçe. Dema digihêje nêzî gund, bala xwe didê ku dîkekî spî mîna melê camiyan bi dengekî bilind diqîre, kêfa rovî gelekî tê. Hema bi hêrs nêzî dîk dibe. Diçe li ber dîk disekine û wî di kîsê xwe de dehesibîne û ji xwe re dibêje, “Şîva min derket”. Rovî ji dîk dipirse debêje, “Gelo ma çi qewimiye li gund, ev bû çend roj qet nema deng û olan jê tê?” Dîk lê vedigerîne û dibêj, “Na, tiştek nebûye tu tişt neqewimiye” rovî lê vedigerîne û dibêje, “Ka ajal û sewal, ka mirovên gund ez qet kesî nabînim?”

Dîk dibêje, “Li orta gund odeyeke duqat heye û hemû mirovên gund li cem mele (seyda) li dora axa û keya, li odê rûniştine.” Li ser vê axaftina dîk, rovî kûr difikire û ji xwe re dibêje, “Jixwe dîk malê min e, de ez bi navê yezdan kim dîk viran li min dike tu mirov, keya û axa tune, jixwe mele jî çîrok e, yên ku ew qal dike mirîşk û elokên gund in, ew dibêje qey ez ehmeq im ji min vedişêre. Rovî li dîk dizîvire û dibêje, “De baş e, ez ê herim ziyaretiya mele bikim û ez ê vegerim.” Kelekela germa havînê ye. Hemû seh û kûçikên gundiyan ji birçî û tîbûna ji qudûm ketine, bi tenê xaniyê duqatî li ser xwe maye û hemû kûçikên gund xwe li siya xanî dirêj kirine.

Rovî di nav xirbeyên xirabe de dimeşe û di serê xwe de mirîşk û elokan derbas dike, dema digihêje ber xanî û derbasî hewşê dibe, çi bibîne, hewş tijî kûçik û seh in. Ji ber germa û ji tînan hemû zimanên wan di devên wan re derketiye û dikin helkehelk. Dema kûçik çav li rovî dikevin, qêrînî ji birçînan ji nav wan tê, hemû bi hev re êrîş dikin. Rovî rê şaş dike û xwe li paceya mexzenîkê diqewimîne û bi zorê xwe ji nav lepê sehan xilas dike.

Dema tê ba dîk, nema çavên wî dîk dibîne lê dîk bang lê dike û dibêje, “Ma te çayek jî venexwar tu yê bi ku de biçî?’’ Rovî bi zorê stûyê xwe dizîvirîne û dibêje “Bi sê telaqê jin berdanê hetanî ku ev mela meleyê vî gundî be û ev cimet cimeta vî gundî be nema rêya min bi van deran dikeve’’ û dibêje, “Te got çi ji min re, te got ejderha?” Dîk ji par re deng lê kir û got: ‘’Heyran ev bû deh car gund û bajar xira kirin, talan û tajan kirin, kuştin, xistin zîndanan, kirin çar parçeyan, kirin mît, cerdevan û bekçî, lê cardin ji holê ranebûn. Car din vegeriyan cih û warên xwe ava kirin bajar û gundên xwe. Ma ereb ,tirk û farisan nikaribûn, di nav gund û bajarên me de cirîtan bavêjin. Ma qey tu yê bikaribî hey ehmaq!”

Dîk, her du baskên xwe li hevdu xist û bi dengekî bilind qêriya. Rovî reviya li paş xwe nenêrî.

# Miradê Kinê û hin bîranîn

Bêrîvan Kayi

**Li Kurdistanê, wê kêm kes hebin navê Miradê Kinê nebihîstibin. Bi boneya koça wî ya dawî, em bi du kesan re axivîn ku li şevbuhêrkan lê guhdarî kirine**

Miradê Kinê di nav muzîkjenên kurd de xwedî terzeke cuda û cihekî balkêş e. Di salên 70'yî de, li gelek gund û bajarên herêma Mêrdîn, Sêrt û Êlihê wekî 'Mîrê Ribabê' tê nasîn. Ji şevbuhêrkan heta dawet û gelek şahiyên li herêmê digere û bi deng, stran, çîrok û henekên xwe di dilê gelek ciwanan de cih digire! Demekê her çi qas hin alî û derdor dixwazin wî bi memûrtiyê ji stranbêjiyê dûr bixin jî ji eşqa stran û ribaba xwe dev ji stranbêjiyê bernade. Ji ber ku êdî wî dengê Mihemed Arifê Cizirî Eyşe Şan û gelek stranbêjên kurd ên din kiribû.

Di dawetên salên 70'yî de li her gund û navçeyeke Mêrdîn û Sêrtê ji hindik kesan re bûye şens ku strana 'Seyrê û Eliyê Memed' ji dengê Miradê Kinê guhdar bikin. Li gelek gundan ciwanan dixwestin ku li şevbuhêrka Miradê Kinê bi strana 'Seyrê û Eliyê Memed' guhdar bikin û dilê xwe şad bikin. Ciwanên ku di wan rojan de ev şens ketiye destê wan û bi dengê stranên Mirado dilşad bûne, dibêjin ax hezar xwezî bi wê kêliya ku li ber dengê Mirad û ribaba wî! Abid Kayi û Abdulhakîm Ozhan hin ji wan kesan in ku di navbera salên 1970-74'an de gelek caran tev li şevbuhêrka Miradê Kinê bûne û bîranên xwe bi me re parve kirine.

Abid Kayi (75) ji gundê Ewtê yê navçeya Misirce ya Sêrtê ye. Ji zaroktiya xwe ve kul û meraqa wî guhdarkirina stranên Mihemed Arif, Eyşe Şan, Erdewan Zaxoyî, Evdalê Zeynikê û Miradê Kinê ye. Loma ji xwe re ji sûka Sêrtê teybeke reş kiriye û bi vî awayî tim bala xwe daye ser stranbêj û dengbêjên çanda xwe. Abid Kayiyê ku tim xwestiye strana Seyrê ji dengê Miradê Kinê bibihîzê, der barê Miradê Kinê de diyar kir ku cara ewil ew Miradê Kinê di sala 1974'an de li daweteke gundê Ewtê nas dike û wiha got: "Li nav civata gund me bihîst ku dê Miradê Kinê were gundekî nêzî me dawetê. Dema min ev yek bihîst, hema min çû pîlên teyba xwe nû kirin û bandeke 90'î stand û min wek zarokekî ku haziriya eydê dike, xwe wiha amade kir. Şeveqê zû jî min teyba xwe xist destê xwe û min berê xwe da gund."


**Seyrê û Eliyê Memed**

Kayi dema cara ewil strana 'Seyrê û Eliyê Memed' ji Miradê Kinê dibîhîze teyba di destê xwe de ji bîr dike û nêzî saetekî bênavber bi ciwanan re yên ji gundên derdorê (Şemsê, Bizênka, Gêrê, Tilê,Baciriyê... ev gund di bin bendava Ilisuyê de man!) hatineli Mirado guhdarî dike. Kayi der barê vê bîranîna li gundê Ewtê de wiha got: "Dema ku min ew dît, min ji çavê xwe bawer nedikir ku ew kesê di qunciké odeya mêhvanan de rûniştibû Mirado be! Hema bêje min stranên wî tev ji ber kiribûn lê strana Seyrê û Eliyê Memed di dil de dijiya hewqasî min ji dil û can hîs dikir. Di wê kêliya de êdî ez jî li Welatê Hesenê Heydaran bûm! Hê ez di nav vî halî de bûm Mirado got 'xwarzê tu dibêjî qey tu bi heyvê ketî'. Min di wê kêliyê de nikarîbû ti tiştî bibêjim. Banda min a 90'î jî virtûvala di destê min de mabû!"

Abid Kayi di berdewama axaftina xwe de bi kêf û coşeke mezin qala bîranên xwe yên ku 50 sal in di bîra wî de ne dike û piştre berê xwe dide gundê Derêca (Mêrdîn) mala Mirado ji bo banda xwe tijî bike. Abid hestên xwe wiha tîne ziman: "Mirado ji me ciwanan re xewn û xeyalek bû. Piştî ku Mirado band ji bo min dagirt êdî hevalên me yên din tev ji me hesidîn! Ew derfetên ku her kes dema bixwaze li wî guhdarî bike tune bû ji ber wê jî ez yekî bişens bûm ku Mirado ji bo min bandek tije kiribû."

**Hunereke dewlemend**

Abdulhakîm Ozhan (76) jî ji gundê Bizênka yê navçeya Misircê ya Sêrtê ye û di 14-15 saliya xwe de Miradê Kinê nas dike. Ji bo ku dengê Mirado guhdarî bike berê xwe dide gundê Tilê yê Sêrtê. Piştî wê hevdîtina wan hevaltiya wî û Mirado dest pê dike. Abdulhakîm, bi hezkirin û bêrîkirineke kûr qala Miradê Kinê û stranbêjiya wî dike û wiha dibêje: "Mirado xwedî hunereke dewlemend bû. Stranên xwe di kêliyê de li gorî civata di nav de yan jî li gorî xwestekên gohdarvanên xwe çêdikirin û meqam li wan dianî. Di nav stranên wî de ji xeynî mijarên evîniyê û yên şer û pevçûnan ji dara belalûkê, kizwanê berûyê heta mijara çêlika zer wî rêzikên xwe li hev dianîn."



Abdulhakîm di axaftinan xwe de bal kişand ser şêweya Miradê Kinê ya dewlemend û nêzîkatiyên nifşên niha yên ku bi muzîkê re eleqedar in û axaftina xwe wiha domand: "Nifşên niha min ne bawer e ku ji stranên Mirado fêm bikin. Ji ber ku ciwan ji çanda xwe dûr ketine. Bi zimanê xwe naaxivin, çandê ji ser guhê xwe ve diavêjin!"

**Mîtosa Mala Kinê**

Dema em bala xwe didin muzîka Miradê Kinê her çûye li herêmê bûye ekolek. Tenê ne Mirad mala Kinê tev bi rengê lêxistina ribabê hatine naskirin. Li gorî agahiyên ku Abdulhakîm Ozhan parve dike, li gelek gundên Herêmê ji bo ku mala Kinê pir baş li kemaçê bi kar anîne, mîtos jî li nav civatên gundên heremê hatine gotin. Li gorî vê mîtosê Îsayê Mala Kinê, rojek ji nişka ve wenda bûye û çûye daweta kurê Mîrê eciniyan kiriye. Heta demeke dirêj Îayê Kinê li cem wan dimîne û heta ku rojekê bêriya malbata xwe dike û dibêje ez ê herim cem zarokên xwe. Êdî li ser xatirê ku Îsayê Kinê baş li ribabê dixe eciniî wî dişînin cem zarokên wî. Êdî çanda ribabê li vê herêmê bi mala Kinê pişt re jî bi Miradê Kinê tê belavkirin. Sedema ku Mirado şêweyeke cuda û balkêş ribab bi kar aniye, di nav civatên gund û bajarên herêmê de ev mîtos hatine gotin û belavkirin.

Miradê Kinê di 17'ê kanûna 1984'an de diçe ber dilovaniya Xwedê.

# Hejmara 8'emîn a kovara Şermolayê derket

Hejmara 8'emîn a kovara Şermolayê ya wêje û çandê ku bi zimanê kurdî û erebî tê weşandin, derket.


Dosyaya hejmara 8'emîn "Bizava wergerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê" ye. Ji ber girîngiya wergerê û rola wê ya mezin di pêşketina zanistî û çandî û dewlemendiya miletan de, ev mijar weke dosyaya hejmarê hatiye hilbijartin.

Di vê hejmarê de berhemên bi dehan nivîskar, rewşenbîr û lêkolînerên ji pêkhateyên cuda yên Sûriyeyê hene. Beşên kovarê ev in: Analîzên hizrî, dosyaya hejmarê, lêkolîn, hevpeyvîn, nirxandina pirtûkan, werger, jin û çand, huner, çîrok, helbest, gotar û raporên wêjeyî.

Di pêşeka hejmarê de wiha tê gotin: "Werger, di sedsala nozdehan de, piştî sedsalên paşverûtiya serdema dagirkeriya Osmanî, roleke mezin di vejandina gelên Rojhilata Navîn (ereb, kurd, suryan, ermen û yên din) lîstiye. Faktora herî berbiçav a di vî milî de xwedî rol bû, danûstandin û têkiliyên hin ronakbîran bi çanda gelên ewropayî re bû ku bi rêya şandeyên ewropî yên dihatin herêmê pêk dihat. Di encama van tekiliyên çandî de, ronakbîrên gelên deverê berhemên fikrî, wêjeyî û zanistî yên herî berbiçav ên ewropî wergerandin û veguhastin zimanên xwe û di vejandin û pêşvexistina wêjeya gelên Rojhilata Navîn de gavek bi bandor avêtin.

Hêjayî gotinê ye ku heger wergera ramanên zanistî û çandî di warê pratîkî de ne xwedî bandor û geşedaneke erênî be, ew ê di pêşveçûna zanistî û şaristanî de bê encam be."

Hejmara 8'emîn a kovara Şermolayê 204 rûpel e, bi zimanên kurdî û erebî hatiye çapkirin.




**Naveroka beşa kurdî**

**Pêşekî:**
- Werger, Parastin û pêşkeftina şaristaniya mirovahiyê ye.. (Desteya sernivîskariyê)

**Analîzên hizrî:**
- Bilindbûn (Abdullah Ocalan)

**Dosya:**
- Werger (Aram Hesen)
- Pirsgirêka Têrmsaziyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî de (Berzo Mehmûd).
- Bizava Wergerê li Rojavayê Kurdistanê (Nêçîrvan Evdilezîz)

**Lêkolîn:**
- Peymana Sevrê û Serxwebûna Kurdistanê (Kakşar Oremar)

**Hevpeyvîn:**
- Li gel nivîskar û wergêr "Ebdelah Şêxo" ye (Aram Hesen)

**Jin û çand:**
- Elmas Xan...Elmasa Dengbêjiya Kurdî 1894-1974 (Vejîna Kurd)
- Xwezî.. (Salîha Qasim)

**Pirtûkên derketî:**
- Firîna Bi Baskên Şkestî Evîna li ber siya xwediyên alên reş .. (Lukman Polat)
- Pirtûkên derketî (Desteya sernivîskariyê)

**Werger:**
- Çend Wêneyên Helbestî (Ebbas Kiyarustemî..Wergera ji Erebî: Qadir Egîd)

**Huner:**
Herger (Fatma Ehmed)

**Çîrok:**
- Erê Ez Bûm.. (Xoşman Qado)
- Gorkoler.. (Zîlan Hemo)

**Helbest:**
- Çerxa felek.. (Mihemed Abdulezîz)
- Xwîna Helbestê.. (Mehmûd Misto)
- Kin Bû Buhar.. (Fîxan Hîmo)
- De ka em biçin (Mihemed Welîd)

**Serbest:**
- Navenda Mezopotamya Ya Wergerê (Darwîn Darî)
- Wêje.. (Beşîrê Mele Newaf)
- Dilekî Birîndar Şikoyê Hesen .. (Occo Mahabad)
- Romannasî.. (Lîlav Îsa)
- Gundê Başemrê.. (Şerîf Mihemed-Welîd Bekir). ***QAMIŞLO***

# Em te ji bîr nakin kewa gozel

Veysî Varli

Hin tişt hene mirov zane lê bîne ziman derdek e, neyne ziman jî derdekî hêj mezintir e; Eyşe Şan ji bo min ev e.

Di warê stranbêjiyê de Eyşe şan xwedî gewrî û pergala dengê kurdî ye. Di warê gotina stranan de gelek delal û hêja pergala dengê muzîka kurdî ya oktavek ji 17 navberê ne wek hev pêk tê û ritmên muzîka kurdî bi kar tîne ku ruhê xwe ji grî, coş (govend), kar û şer digire. Di warê hunermendiya muzîkê de gelek hêja û delal e.

Ez dixwazim du bîranînên der barê Eyşe Şanê de bi were parve bikim. Ya yekem min bixwe ji Husnu Îpekçî bihîst.

Husnu Îpekçî li amedê li taxa derê Mêrdînê li xeraja kamyonan, dikanek lastîkên wesaîtan vekiriye. Rojek li qehwexanê li ber derî rûniştî ye, jineke bir xweşik di ber re derbas dibe û Husnu ji tolaziya xwe bi tirkî gotin davêje jinê û dibêje: "Gozleri fetandir, kaşlari aldi benî. Tukendi sabrî qararim kalkarsam operim seni // Çavê wê dilrevîn e, birûyên wê dil ji min girt. Êdî nema sebr û taqeta min, ez rabim ez ê te maç bikim." Jin erênî yan neyînî tu bertek nîşan nade û derbas dibe diçe. 3 roj şûn de ew jin û xortek pê re tên dikana Husnu Îpekçî. Husnu ditirse û nizane çi bike. Jin tê ji Husnu re dibêje Husnu îpekçî tu yî. Husnu dibêje erê. Jin didomîne û dibêje: "Li gor gotinbêjan tu li Cemiyeta Muzîkjenan dimînî û karê muzîkê jî dikî." Husnu dibê erê. Li ser vê bersivê jin dibêje tu dikarî dersa muzîkê bide min jî. Ew jin Eyşe Şan e û şeş mehan Husnu Îpekçî dersa muzîkê li mala xwe ya li hember dibistana Ziya Gokalp dersa muzîkê dide Eyşe Şanê.

Wê demê li Amedê du beş muzîkjen hebûn. Beşa yekê, li pavyonan stran digotin û yên jin di heman demê de ji maseyên serxoşan re xizmet dikirin. Beşa duduyan jî yên bi navê cemiyetê xebat dikirin û herî zêde di qonaxên wekî Saman (Gazî Koşkî), Cemîl Paşa de şevbuhêrkan de cih digirtin. Ji ber ku Eyşe Şan jin bû, bi destên hin kesan dixwestin wê li pavyonê pê stranan bidin gotin, lê ji ber malbeta wê ev pêk nehat. Kesê ku bi navê Avdilah Naîl BAYSÛ bi deng û sewta Eyşeşanê hay dibe û wê ji Amedê dibe Dîlokê (Entab) du salan li vir dimîne. Li radyoya heremî û li ser hin dikên wekî xazinoyan stranbêjiyê dike.

Zagona 1960'î hinek derfet daye ku stran bi kurdî werin gotin. Kesên wekî Mahmûd Qizil, Şûkrî Îzol û wekî din gelek kesan bi stranên kurdî plaxan amade kirine. Di sala 1963'yan de li Stenbolê şîrketa plaxan a bi navê Sahibinin Sesî vedibe. Evdila Nail Baysû û Mahmût Tezcan, Eyşe şanê dibin Stenbolê û plaxa strana wê ya yekem çêdikin. Bîranîna duyem jî ya di nav min û wê de ye. Sala 1996'an, meha sibatê bû, ez çûm Stenbolê MKM'ê çend roj li wir mam û li zanîngeha Boxaziçiyê piştî panelek min a bi alîkariya dengbêj û amûrjenê kevançeyê Ekremo, ez derbasî Îzmîrê bûm. Hêj Eyşe Şan neçûbû ber dilovaniya xwe. Bi alîkariya hevalekî em çûn mala Eyşe Şanê, li ser muzîka kurdî û rewşa wê rojê me sohbet kir. Ewil min xwe pê neda nasîn, dema em rabûn min xwe da nasîn.

Min jê re got ez lawê M. Reşît ê xwediyê dikana ber camiya Erebşêxê me. Sekinî kelogirî bû û ji min re got ew reşikê pîsik ê kevir davêt paytona ku ez lê siwaribûm tu yî. Min got erê. Ji min re diyar bû ku ew qas sal derbas bûye, ez wê demê 5/6 salî bûm lê ew hesreta Amedê û ya taxa xwe her jiyaye û ji bîr nekiriye. Em jî te ji bîr nakin kewa gozel û deng hêjaya me.

xwebûn

14-20 Kanûn 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 52

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazışleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Ev dinya hanê cihê xeman e!



Keştiya Alalû

Agît Yazar

**Li jêra zinêr, kaniyek ji tahtê diherike. Mûmên nîvçe yên helandî li ser dîwarê kaniyê hebûn. Her wiha quloç û seriyên ajalan, yên hatibûn gorîkirin dixuyan. Ne li cihekî, ne li duduyan. Hema hema li ser her kaniyê, li ber devê her şikeftê bi dest hatine çêkirin**

Xewa li welêt, sivik e. Ango meriv li welêt zû xewa xwe dişikîne. Kesên li Çuqûrovayê, yan jî yên li perê deryayê dijîn, vê yekê baş dizanin ku meriv zûbizû têrxew nabe. Îklima deryayê, meriv gevlerî dike; tu 18 saetan razêyî jî meriv têrxew nabe; dîsa meriv cangiran û kavarî ye. Çaxa meriv ji xew şiyar dibe, meriv dibêje qey mar bi meriv vedaye. Bi gotineke din, meriv timî nola xewgerokan, bi vir de bi wir de dihênije û ditewtihe, lê xewa li welêt ne wanî ye. Nexasim jî gava meriv li Dêrsimê radizê! Hema tu bîstikekê çavê xwe bidî ser hev, tu xewa xwe dişikînî. Laşê meriv nola pîşo û melhemê nerm, nola perê nahma sivik û nola şivterkekê jidyayî ye. Bi vê hilkeftê, heke tu li welêt bijî temenê te dirêj e. Heke tu li Dêrsima welêt bijî, temenê te dirêjtir e. Loma jî em di sawgura sibê de rabûn ser xwe. Yek û du me xwe nola çipiskê tevjidand. Ez berî ekîbê daketim jêr.

Cotek qijalk, bi raterqa hev ketibûn, bi qijeqij, di bin ewrê belek û kurîşk kurîşkî re derbas bûn. Kûçikekî qilçixşîn ê qurma devê wî reş, ji bin sêncê rabû ser xwe, tevzînek da xwe, xwe ji hev rakişand. Paşê devê xwe qîç kir, têra dilê xwe bawîşkî û zimanê di devê xwe de kokevanî kiribû, ber bi dawiya gewriya xwe ve gindirand û dengekî nola dengê giriyê zarokekî li ber şîr, di gewriya xwe de kûzkûzand. Hênkahiya şîrgermî ya berbangê, ji çiyayê li derdorê, bêhna gezo ji daristanên berû û mazî bi xwe re dianî û em jî nola bêhna wî gezoyî, dadinizilin kolanên Dêrsimê...

**Heybeta Pîr Seyîd Riza**

Ma meriv biçe Dêrsimê, meriv neçe tewafa pêşengê gewre, Pîr Seyîd Riza dibe qey! Em jî wanî dikin. Em diçin wê parqa li ser navê pêşengê gewre, Pîr Seyîd Riza hatiye nezirkirin û peykerekî wî yê bi hêbet li wir daçikandiye. Em derdikevin huzûra giyanê wî. Gava meriv li sekna wî, li xet û derbirînên li ser rûyê wî dinêre, meriv têderdixîne ev kalemêrê bihêbet, ji kesayetiyeke zanamend wêdetir e. Şik û guman jê re tune ku manewiyata pêşneng pîr Seyîd Riza, di asta qenc û xasên xwedê de bilind e. Lewra li pêşberî bîrdariya wî ya giyanî, hesteke tîr li meriv dadilûse.

Te dît dinya ye. Rojekê hûn biçin Dêrsimê, nebe nebe hûn bi çavê peykerekî bêgiyan, li peykerê pêşengê gewre, pîr Seyîd Riza binêrin! Lewra, hemû kirin û gotinên vî pêşengê me, li wan dewrûberan dizinge. Nexasim jî gotinên wî yên gava ber bi benê sêdarê ve dimeşe, delka xwe dide celad û bi wî dengê xwe yê qelew wiha di guhê dîrokê de diqîre: "Ji wî yê li Enqereyê re bibêjin: min serî bi reng û rîpên wî re dernexist, ev ji min re bû kul, lê min jî li ber wî çong netewand, bila ev jî ji wî re bibe kul/Ewladî kerbelayîmo! Bêguneyîmo! Eybo! Zulmo! Cinayeto!..."

Xwînerên ezîz! Di esasê xwe de divê niha ez li ser kelehên li derdora Mazgêrtê bûma û min qala wan bermahîyên pêşiyên me yên Xaltî bikira, lê vaye ji we ve eyan e ku em dikin nakin destê me ji Dersimê nabe.

Dêrsim, bi her awayê xwe sertaca welatê me ye. Em bi van hestan, esnafên wê yên rûken, mirovên wê yên xwenda, kalemêrên rî û simbêl gijik ew çend jî paqij û zanamend; gundiyên bazarvan ku sîrdimên çiyayê Dêrsimê yên yek-serî anîbûn ji bo firotanê, her wiha jinên şelwerê gundiyan li wan û tîşortê Che di ser de berdayî. Em van rengan, van bedewiyan tevan li dû xwe dihêlin û em berê xwe didin Mazgêrdê.

**Mazgêrd**

Mazgêrd, bi meşa çolbeyarî bi qasî 15 km dikeve başûrê Dêrsimê, lê em di ser bendava kebanê re difitilin. Loma jî 35 km rê dirêj dibe. Li nav Mazgêrdê, kelehek heye.

Her wiha li gundê Kelê jî kelehek heye. Me ji bo keleha gundê Kelê, kir û bira xwe kiribû, lê em naxwazin bi nenasî biçin...

Hema hema li her navenda niştecihan, hin kes hene ji nav civakê pengizîne û bi her awayên xwe dijber in. Gelek kar û xebat ji destê wan tê, lê tu xebatê nakin. Heta meriv dikare bibêje, şerab, bîra û cixareya van kesên wanî, li ser pişta esnaf û mirovên derdorê ye. Gelekî enteresan e, evan kesên wanî misyonên were li xwe bar dikin, tu dibêjî qey ew kes waliyê wî bajarî ye, yaxwud key-meqamê wê navçeyê ye. Kesên wanî, herî zêde bi kêrî mirovên xerîb tên. Hevlatiya kesên wanî, ji bo demeke kurt pir xweş e, lê piştî wextekê, êdî bi meriv e dibe benîştê mezeloq.

Me ji çend kesan pirsî, ka gelo yekî bi herêmê dizane dikare bi me re were an na. Kalemêrekî li parqê rûniştî, gopalê xwe ber bi boyaxkarekî qondereyan ve dike, dibêje "hûn biçin ba wî boyaxcî, ew ê ji we re bibe alîkar".

Gava em silavê didin boyaxkar, hem firça di destê wî de, hem jî serê wî yê bi firçê re dihezikî, disekine. Em merema xwe jê re dibêjin. Hîn boyaxkar nepeyiviye, hew em dinêrin yek di ber me re derdikeve, dibêje “va me ez heme, ez bi her dera Dêrsimê dizanim!” Camêr dibêje firt û xwe di erebê re dike.

Kesekî amî tam, li gorî tarîfa kesê li jor qalkirî ye. Çawa li erebê siwar dibe, ewil rê ji hevalê ajokar re tarîf dike û paşê dest bi çîroka jiyana xwe dike: hem çiyager e, hem defîneger e, hem hostayê elektirîkê ye, hem sê zarokên wî li dû hev çûne ber rehma xwedê, hem wî û hevjîna xwe hevdu berdane, hem ji hêla leşker ve hatiye birîndar kirin, hem çar salan di zindanê de razaye, hem wextekê çûye Iraqê/başûrê Kurdîstanê, hem li wir ji xwe re evîndarekê dibîne û wesaîre, wesaîre…

Dostê me yê nû, li şîpekê van serpêhatiyên xwe ji me re rêz dike. Di vê navberê de, navê dostê me Kenan e. Min bi şekir gotinên Kenan birî û min ji wî tika kir ku ew derdorê bi me bide naskirin. Kenanê min û we vêdikeve çiya, gelî, şikeft û heta goristanên li herêmê jî ji me re tarîf dike. Çiyayekî li hember destnîşan dike û dibêje: "Li ser kelata wî çiyayê hanê, gelek nivîsên mîxî û îşaretên dîrokî hene, lê her kes nikare derkeve ser wê kelatê. Ez çûm derketim ser kelatê, lê li vegerê encax min dikaribû bi werîsan xwe bera jêr bida û daketama jêr."

Min devê xwe ji hev vekir, da ku ez tiştekî bibêjim, lê Kenan gotina bin depisîne devê min û dibêje: “Tu qet nikarî derkevî jora wê kelatê. Encax dînekî nola min ji canê xwe acisbûyî dikare derkeve jora vê kelatê.”Kenan, kuleke heft-şaxî berdide ser dilê min û diçe!

Kenanê rêber, me li ber zinarekî, çikîtenê li rastekê disekinîne. Zinar, bi qasî avahiyeke du-sê qatî bilind e. Li jora zinêr devê jûr/odeyekê dixuyê. Ez bi pêpelokêve radipelikim. Ez tiştekî jê fêm nakim. Hem dişibiya tirba bîrdariyê ya navdarên Xaltî-Ûrartûyan, hem jî dişêbiya avahiyeke yekçavî.

Li jêra zinêr, kaniyek ji tahtê diherike. Mûmên nîvçe yên helandî li ser dîwarê kaniyê hebûn. Her wiha quloç û seriyên ajalan, yên hatibûn gorîkirin dixuyan. Ne li cihekî, ne li duduyan. Hema hema li ser her kaniyê, li ber devê her şikeftê bi dest hatine çêkirin, tiştên wanî meriv matmayî dihêlin, tên dîtin. Ev yeka hanê ji ananeyên gelê kurd ji dem û dewranên gelekî kevn daweriviye, heta roja me ya îro hatiye.

Paşê Kenanê rêber, me dibe nav goristanekê. Sêwirandina li ser kêlên wan tirban, sêwirandina pezê biquloç, ango mîh û beranên biquloç hatibûn taswîrkirin, lê keleh ji wan tirbên dîrokî, hatibû talakirin.

Ji ser goristanê em derbasî gundê Kelê dibin. Gund, navê xwe ji keleha xwe wergirtiye. Jê re dibêjin, keleha gundê Kelê.

Şikir ji xwedê re, piştî em li ewqas cihan geriyan, vaye em hatin ser keleha esil a mebesta vê gotarêyê ye. Li kêleka rê, zilamekî bi nigekî xwe dabû ser darê di bin çengê xwe de. Kenan dibêje: “Mayîn bi vî zilamî de teqiyaye û ji nigekî xwe bûye.”

Em tomofîla xwe li jêr parq dikin û bi kelehê ve radipelikin. Gava em derdikevin jora kelehê, dengê virevira droneke leşkerî tê. Diron, tibabekî bilind difire, lê dîsa jî tibabekî me dixîne nav fikaran. Me da ser hev, da ber hev. Me biryar da ku em serbest tevbigerin, ew ê çêtir be. Gumlegê min sorê kur e. Ez di dilê xwe de dibêjim. Baş bû min ev gumlegê xwe yê sor li xwe kiriye.

Piştî em lêkolîna xwe bi encam dikin, em Kenan li Mazêrdê datînin. Ez ji Kenan dipirsim, dibêjim tu telefonê jî li ser xwe nagerînî? Baş e em careke din werin, em ê te li ku derê bibînin?

Kenan dibêje: “Min ji kûçik û pisîkên kolan bipirsin, ew ê we bîne ba min!”

Em lêdixin berê xwe didin Amedê. Dengê strana Seît Axayê Cizîrî ji teyiba me bilind dibû: ew milkê kurda tev xêr û bêr e/alik mehden e tev zîv û zêr e/em îro çi bikin maye ji xelkê re/em îro çi bikin maye ji xelkê re/hey eman eman sed caran eman/xelkê em kuştin avêtin çeman/tev şêr û hakim nav em de neman/her kes awakî em her ya xwe man/ew milkê kurda temam kanîne/ew milkê kurda temam kanîne/her mêrik kurda bi hefsed mêrî ne/îro em çi bikin me kesik nîn e/her mêrik kurda bi hefsed mêrî ne/îro em çi bikin axxx em bêxweyî ne/ew milkê kurda hemû seyran e/ew milkê kurda hemû seyran e/ew cihê henê cihê xeman e/ev dinya henê cihê xeman e

**Kelaha gundê kelê**

Keleh, li gundê Kelê ye û 12 km dikeve rojhilatê Mazgêrda Dêrsimê. Keleh, nola hêlîna teyrê baz, li ser kelateke bilind hatiye avakirin. Dîroka wê ya di ser e tê zanîn, xwe dispêre du hezar û 800 sal beriya niha. Heta niha, tu kolandineke arkeolojîk lê nehatiye kirin. Ev keleha hanê, ji hêla pêşiyên me yên Xaltî-Ûrartûyî ve hatiye avakirin. Li van derdoran, ji her 20-30 km’yî, keleheke ji hêla pêşiyên me ve hatiye lêkirin tê dîtin.

Li jora kelehê, tunelek tê dîtin. Tunel di tahtî de hatiye kolandin û ber bi bakûr ve berjêr dibe. Tunel, ji bejna meriv bilintir e. Gava meriv li tunelê difitile, derdikeve jor. Menzelek derdikeve pêşberî meriv û sarinceke kûr di binê wê menzelê de tê dîtin.

Bîst metre li rojavayê tunelê, tirbeke bîrdariyê ya hukumdarê Xaltî/Ûrartûyan heye. Ev tirba hanê duçavî ye. Di her çaviyekê de, nîşek tê de heye. Li ser dîwarê tirbê hêla hundir, gelek sêwirandin hene. Mixabin pir ji wan hatine herifandin, lê gava meriv dikeve hundirê tirbê, li ser milê rastê xaçek tê dîtin. Ev xaçê hanê, vê dema dawî li ser hatiye kolandin, lê li ser milê çepê nivîseke mîxî tê dîtin û ev nivîsa mîxî, vê kelehê girîngtir dike. Tê texmînkirin ev nivîs di serdema Menûa yê keyayê Xaltiyan de hatiye kolandin.

Gava meriv derdikeve ser jora kelehê, meriv qadeke taybet dibîne. Tahtekî yekpare heye. Ser wî tahtê hanê re kirisandine. Li hêla rojhilat, dîwarekî bilind hiştine û du nîş di dîwar de vekirine. Ev qada hanê, bi her awayî dişibe qada pîroz a li paytext Tûşpayê. Rêveberê Xaltî, di van qadan de rêûrismên fermî pêkdianîn. Gava şandeyeke fermî pêşwazî dikirin, gava hikumdar text diguhert, yan jî gava îbadetên xwe yên olî dikirin, ew rêûresmên fermî li vê qada pîroz li dar dixistin.

Li kelehê gelek avahiyên din yê balkêş hene. Yek ji wan jî sarincên wê yên balkêş in. Di navbera tirba bîrdariyê û tunelê de, sarincek heye. Sarinc heta nêvîxetimandî ye, lê dareke berû di wê sarincê de şîn hatiye û tibabekî mezin bûye. Gava meriv lê dinêre, dişibe guldankekê. Dara berû, sembola esaleta kurdan e. Esaleta kurdên kevnar, di sarinca dîrokî de şîn hatiye û geş bûye. Bi hêviya esaleta miletê me yê kevnar, qet neçilmise û îlelebed mayînde be!

